# BABA Ê KELEŞ

БАБАЕ К'ӘЛӘШ

# NÎŞANÎ

# Нишани

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

# PÊŞGOTIN

Heta sala çûyî jî min navé vî xweşmérî nebihîstî bû. Pirtûka wî a bi navandina "Nîşanî" min li ba biraderekî dît.Dawî xwandina çend rûpelén wî a péşin ez ecébmayî bûm li zmané wî a tégihiştî.Û bé rawestin min xwandina wé kuta kir. Dîsa jî térî vé pirtûké nebûm û min ew ji tîpé Kirîlî (Rûsî) guhazte tîpé Latînî ko keysa min hebe çap bikim. Çîrokén weha xweş û tégihiştî di wîjeya me a hemdemî de zehf nînin,bo péşvebirina nvîsandin û xwandina Kurdî em hewcedarî afrandinén wisa ne.Bivénevé mirov zor spasdarî péşkéşî vî camérî zmanxweş dike..

Zor mixabim ko min jînengariya vî braderî peyda nekir,keysa min hebû jî. Lé dema me kurt bû. Bo vé yeké em ji xwandewaré xwe tika dikin ko kémasiyé me biborin. Jixwe péşgotina pirtûké bi kurtî di aliyé hevalé giranbiha Emerîké Serdar de hatiye nvîsandin. Giranbihabûna pirtûké di destpéké de berçav bûye,gava mirov vé pirtûké baş bixwîne çare nîne ko serkupiya xwe péşkéşî nvîskar neke û li ber ranebe...

Bo serkaniya wîje û lîteratûriya Kurdî,me pirtûk bo çapkirin û belavkirina di welatén roava de diyariya komela KSSE. kir.

Pirtûk bi zmanekî safî û paqij hatiye nvîsîn.Hévîdarim herkesî ko Kurdî diaxive tédigihîje û fehm dike. Dîsa héviya min ew e ko ev pirtûk di wîjeyî a Kurdî de cihekî piçûk lébelé giring digire. Em ji nvîsar hin afrandinén din jî hévîdar in. silav li her awayî. 2/5/1986

D. Îzolî

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Babaê keleşê dodo ji diya xwe buye sala 1947 a,li gundê Lênûgrî ê.(eyneliya berê ) li nehiya Ecmîazînê.Kalikê wî Dodoê baba,ko gelek qewl,beyt, çîrok û qisêd cimaetê zanî bûn,ber zaronga tifal dinyaeke hêkayetî vekir, nava wî de hez kirin pêşda anî ber bi xezna cimaetê ye zar.

Sala 1968 a,pêy kutakirina metebê re,Babaê keleş unîversîtê Eriwaniyê dewletê para Kurdzaniyê de tê qebûl kirinê û sala 1973 a wê kuta dike.Pêy kutakirinê ew mekteba gundê ser navê Baxramiyan da (nehiya Ecmiazînê) derbazî ser xebatê dibe.Çawa dewsgirtinê dîrektorê mektebê aliyê pirsêd hînbûn-terbiye kirinê da.

Sala 1974-da Babaê Keleş rêdaksiya qazeta "Riya Teze" da dixebite,pêşiyê çawa tercume (wergêr),serwerê pare,lê niha katibê cabdarê (bersîvgêr)

Ewî hela salêd şagirtiyê de diefirand.Sala 1968-a qazeta (rojnama) "Avangard" ê da şêêra (helbest) wî ye bi sernvîsara "Qîza Kurd" bi zmanê Ermenî neşir bû.Hema wê salê ji qazetê "riya teze„ da serhatiya wî yê pêşin bi sernivîsara "xaşxaşk" neşir bû.Salêd xwendekariyê de miqaledarekî qazeta "Eriwanê hamalsaran„ baş aktîf bû.Serhatî,miqalêd wî wê qazetê de neşir dibûn û bi heweskarî dihatine xwandinê.

Serhatiyêd Babaê Keleş wisa jî qazetêd "Grakan tert„ "Erêkoyan Erîwan„ ê de çap dibûn.

Eva berevoka nvîskarê cahilê pêşin e.ko em raberî xwendekaran dikin.Têma efrandinêd wî emrê cimaeta me yî îroyîn e.Bi rabûn-rûniştandin,erf-edet, xeysetê wê ve...

Emerîkê Serdar.

www.netewe.com

Gund nava çiya da bû.Çiya dora gund mil kutabûne milê hev,ew qepeçe ki-rî bûn,te digot qey dixwazin ji dinê bidne birrînê.Lê gund mîna teyrekî bê minet baskê xwe bere-bere li berpala çiya radixist...

Gund dûrî nehiyê bû,navîna wanda her rê hebû,ko mîna kejîkê nehiyê re dida girêdanê...

Berbanga sibê bû,Roê teze nezîr dida û pencê wê ye ewlîn (pêşin) serê çiyaê Axmaxaniye bilind radimûsand.Ba kî nerm dihat û xwe ji xwe re bîhna kulîlkê biharê,bîhna çiya dianî.Otomaşînekî (trambêl) "Volga„ ber bi gund diçû.Otoê de sê meriv bûn:Otoajo,kulfetek û xortekî cahil.

Wê sibê ji gund wan re têlê xistibûn,wekî pîrka Rihan nexwaş e...

Hersêk jî ker (bêdeng) bûn,melûl...

Ji wan hersêka kulfeta nava tefekûriyê (mijûl bûnê) diha kûr de bû.Ewê girmilê xwe dabû derê otoê,destê rastê dabû ber eniya xwe û ketibû nava mitaala.Bîhranîna wê mîna guloka rîsvedirêşiyan,vedirêşiyan ber bi salêd buhurî diçûn...

"Demek pîrka Rihan nexwaş e,- ew fikirî- lê wekî... Na,na- ewê dilê xwe de got,-pîrkaRihan gotî bijî„ .Ewê ker pencera kêleka xwe vekir,serê xwe derxist der ve. û bîhranîna wê dîsa mîna pêlê çemê biharê yê li hev ketî rê nedane hev...

... Pîrka Rihan cînara wan bû.Mêrê wê zû ve wefat bûbû,ew bû û du zaroyêd wê - qîz û kurek.Pîrka Rihan kulfeteke rehm bû.Gund de qedrê wê gelekî zanibûn û çûk-mezina jê re digotin "pîrkê„ ew,kurê pîrka Rihanê Mirad û Seyad tevayî dersxanekê de hîn dibûn.

... Seyad demekê li wê nihêrî.Belgîzar dîsa wisa rûniştî bû û ketibû nava mitala...Ewî zehf rind zanibû,wekî Belgîzar çi difikire.Nexwast dengê xwe bike,wê ji bîhranîna bide birrînê.

Ewî bi ker cixarek vêxist û dîsa li riya xwe nihêrî.Belgîzarê ev yek fehm kir û xwast ji bîhranîna bê birrînê.

- Seyad,- Ewê pirsî - saet çend e?

Raste,saet ser destê wê jî hebû,lê xwe û xwe jî zanibû,wekî mane tê de nîne ko dipirse.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

- Heyşta bīst kēm e,-Seyad got.- Hē riya du saeta heye.

Kehr būn.

Belgīzarē dīsa rojēd buhurī bīhr anīn...

... Ewana dersxana deha de hīn dibūn.Çend roj mabūn,wekī mektebē kuta kin ū pēkine emrē teze.Nava xortē dersxanē de ewē texmīn dikir,wekī Mirad bi çavekī cūre li wē dinhēre ū ew çav tenē ēd hevaltiyē nīnin... Hevala nav hev re dizīka xeber didan,wekī Mirad Belgīzarē hez dike,lē ewī derheqa wē yekē de tu tişt vē re nedigot.

Rojekē... roja buyīna hevalekī wan bū.Çend qīz ū xortē dersxana wan dilē xwe ber hev vekirin ū yaziya xwe hev re dane girēdanē.Ew jī hēviyē bū,wekī Miradē nēzīk be,dilē xwe li ber wī veke.Lē Mirad nēzīk nedibū... Hingē Seyad bi laqirdī gote Mirad:- Malavao,te çi pozē xwe kiriye qura xwe ū wisa em - tam rūniştī.Em zanin tu Belgīzarē hez dikī,rabe jē re gilīkī bēje, keçika mehrūm xwe de dişewite...

Lē Miradē şermoke wisa jī ji cī ranebū...

Seyad ū Mirad hevalē hev a nēzīk būn,eger hēkek jī biketa destē wan,bēī hev nedixwarin.Dersdara gava derheqa hevaltiyē de xeber didan,eseh mesela Miraz ū Seyad dianīn.

...Otomaşīnē lez diçū.Gişk kehr būn.Belgīzarē demekē li Seyad nihērī,Wisa teherekī,te digot qey teze dibīne.Ew du bū,yanē pēr,wexta Seyad dersxanē de laqirdī (henek) dikirin ū heval didane kenandinē.Īro ēdī lefē spī ketine porē wī.Hemū tişt qey bējī xewn bū,xewneka şīrīn,ko hat ū buhurī...

... Şev ēdī nīvī dibū,gava ewana ji mala hevala xwe derdiketin,ew ū Miraz tevayī çūn,tarī bū,ewē milē xwe kiribū milē Miraz ū texmīn dikir,dilkē wī çawa nerehet lēdixe.Wexta ewana nēzīkī mala wan būn,Miraz destē wē girt ū got:

- Belgīzar,diya min tenē ye,çi difikirī?...

Wana demekē li hev nihērīn,Belgīzarē destē wī berda ū revī malē.

Sibetirē,gava Belgīzarē av dianī,pīrka Rihan gazī kirē:

- Belgē,Belgē,ca elba xwe dayne mal,were,şuxulē min te heye.

Belgīzar diçū ū difikirī:Gelo çima gazī dike?wexta Belgīzar hate hundur pīrka Rihan berda hat,beşirī:

- Rūne qīza min !

www.netewe.com

- Na pîrkê,- ewê got.- Ezê lez im,- û dora xwe nihêrî.

Mirad ne li mal bû.

Pîrka Rihan nêzîkî stêr bû,xurca bûktiya xwe derxist,dezmaleke girêdayî hilda û nêzîkî wê bû:

- Belgîzar,ez qurbana qîza xwe me,min eva gustîla bona nişaniya Mirazê xwe kirriye,ca hela binhêre,hişê te lê dibire?...

Rihan beşirî.Belgîzar soro-moro bû û xwe û xwe jî nizan bû çawa destê xwe drêj kir hilda û kire tiliya xwe.

- Bimbarek be,- Rihanê gotê.

Belgîzar tevhev bû,gustîl ji tiliya xwe derxist,da pîrka Rihan û revî... Der ve dengê Rihanê kete guhê wê:

- Van roja ezê xwezgîniya bişînime mala bavê te...

" Lê wisa jî xwezgînî neşandin„ Belgîzarê axîneke kûr rahişt.

Dest bi şer bû...Behsa nexêriyê mîna şûrekî dilê gund birrî.Ji gund gelek xortê teze berê xwe dane alava şer.Sibetirê Mirazê jî biçûna.Êvarê ew û Belgîzar rastî hev hatin,gelekî cem hev rûniştin û azayî dane xemê cahiltiyê.Belgîzar ecêbmayî ma bû,wekî ew Miradê şermoke nava du roja da çiqasî hatibû guhastinê...

- Belgîzar,- Mirad gotê,- Ezê ji sibê herim.Diya min tenê dimîne.Mala xw îşka min dûr e.Hîviya min te heye,miqatî diya min bî.Nizam çawa dixwast fe hm ke,çawa hevala min,çawa cînar,çawa... Ewî xeberê kutasiyê negotin, lê Belgîzarê fikra wî zehf rind fehm kir.

...Seyad li kulfetê nihêrî.Ewe dîsa nava mitala da bû.Ewî texmîn kir,wekî hesinek dilê wî diso.Nizanbû kumreşî bû,yanê tiştekî mayîn.Ewî cixarek vêxist û gote Belgîzarê:

- Em,gotî sibê zû vegerin,wekî Miraz verêkin.

Belgîzar ser kur de vegeriya,destê xwe nav porê wî re bir-anî û serê wî danî ser sîngê xwe.

- Kurê min,ezê çawa du sala te nebînim?...

Ewana kehr bûn.Belgîzar dîsa kete nava bîhranîna...

...Miraz heme zû-zû dinvîsî.Pîrka Rihan derdikete ber derî û gazî Belgîzarê dikir.

- Were lao,belkê axê me zemanê me re nemîne,em nexwendî man,nikarim namê

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Mirazê xwe bi çavê xwe bixwînim.

Belgîzarê name dixwandin û pêre-pêre caba (bersîva ) wan dinvîsî.Miraz timî pakêtê de du name dişandin:Yek diya xwe re,lê ya din-bona Belgîzarê. Û nama wan diçûn-dihatin.Huba (evîn ) wan bûbû kaxeza rûgirtî,alav dianî û alav (pêt,xurî ) dibir...

Sê sal derbaz bûn.Belgîzarê tirê ew sê sal weedekî bê ser û bê bine,ko rojekê destpê buye û êdî xilasbûna wî tune...

Payîz bû,payiza derengî.Kewke berf serê çiya ketibû.Ew çend roj bûn namea Miraz tunebûn.Belgîzar bûbû kevotkeke perweşiyanî.Ew û pîrka Rihan kêleka hev rûniştin û hêsrê xwînê ji çavê wan dihatin.Lê Belgîzarê gumana xwe nedibirî û ber dilê pîrka Rihan da dihat,wekî ber xwe nekeve,nama Mirazê bên,eseh wê bên.Lê wexta tenê dima,xof û sawê pê digirt,lê wekî?...

Û rojekê jî dewsa nama kaxeza Miraz a reş hat...

Şer kuta bûbû.Ji 24 xortê gund tenê sisê jê vegeriyan.Yek ji wan Seyad bû..

Sala bere-bere birînê gund kewandin.Eşq û şahî ko wextekî gund da temirî bûn, dîsa destpê bûn.Qîz çûne mêra,xort jî zewicîn.

Xwezgîniya gelek caran derê mala bavê Belgîzarê kutan.Lê Belgîzarê pê dabû erdê.Na ko na!...

Dê-bav,der û cînar ber dil de dihatin,wekî cahil e,emr pêşiya wê ye,ser bextê xwe rûmene...

Lê Belgîzar ser ya xwe bû...

Êvarekê jî,ew 20 sal pêşda bû,pîrka Rihan,bavê Seyad û çend cînarê wan derî vekirin û hatne mal.Hinekî şûnda,wexta ewê heyatê de şuxul dikir,dengê bavê wê lê tesele bû.

- Xûşka Rihan zane- ewî digot- wekî Rihan bê destê hersê kurê min jî bigre,bavêje avê,dilê min ber wê dernakeve...

- Belgîzar kehr çû hundur.

- Belgîzar,lao,- pîrka Rihanê gotê - Şîrê diya te,li te helal be.Mirazê min çava da ma,lê tu Mirazê xwe şa be.Seyad xortekî baş e,hevalê Mirazê min e...Hêstirê wê rê nedidane hev...

Belgîzar nîşan kirin.Dawat nekirin,wekî dengê defê nekeve guhê Rihanê. Se yad,,ko pêy şêr re înstîtûta dixtoriyê xilas kirî bû,nehiyê de dixebitî.Du roja şûnda Seyad û Belgîzar çûne nehiyê.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Timē gava lingê wan li gund diket,berē pēsin diçūne mala Rihanē...Wexta kur wan ra bū,pīrka Rihan hate nehiyē,çavronkayī da wan.Hingê Seyad ū Belgīzarê qirar kirin navē Miraz kurē xwe kirin.

... Otoē nēzīkī gund bū.Dītin ber derē mala Rihanē gele cimaet berhev buye. Ewana peya būn ū kehr çūne hundur.Pîrka Rihan paldayī bū ū çavē li riya derī.Gelo hēviya wan bū,yanē?...

Pīrka Rihan venuhirī ser xwe ū hate ruyē wan.

Seyad zenda wê girt ū texmīn kir,wekī bedhal e.

- Ezē pa kim- Rihanē got ū destē xwe bire bin bēlgī,destmaleke girēdayī derxist ū gote Belgîzarê:

- Qīza min,ez zanim ya min ēdī bē feyde ye.Te digot pīrka Rihan Mirazē bē,wē eseh bē,lē kanē?...

Eva ēdī sīh sale ez çavnēriya wī me...Belgīzar,- lēvē Rihanē ricifīn. Ewē desmal vekir ū gustīla nav da pēçayī drējī wē kir.- Eva nīşaniya Mirazē min e.Ezē ewē nedime qīza xwe ū ne jī dixwazim erdē de min re birize. Han bila cem te be.Çawa bîhranīn...

Belgîzarê li Seyad nihērī.Seyad serē xwe kiribū ber xwe,nava mitala da bū...

Ewē gustīl hilda ū ser pīrka Rihanda xwar bū,eniya wē ya sar ramūsa...

Berbangē pīrka Rihan wefet kir.Pēy erdkirinē re ewana vegeriyan.Belgīzarê texmīn kir tiştekī biha,zehf biha xwe re tīne...

sala 1974-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Evdo cînarê me bû.Obê de kesekî ji wî hez nedikir.Gelekî merivekî kut-kuto bû.Ser her tiştî çê û neçê xeber dida,lewma jî kulfet navê wî danî bû "serjink" .lê mêra jê re digot "metê" .Digotin,wekî xana kulfeta wî destê wî xeysetê wî danavî bû û cahil-cahil mir.Ji xanê tenê kurek mabû,Seyid. pêy mirina Xanê re Evdo çû xwezgîniyê gelek jinebiya,lê kesekî ew nestend, çimkî dengê kumreşî û kute-kuta wî,xeysetê wî yî xirab li her dera belav bûbû û Evdo tev de bûbû dendkê jehrê.Lê çimkî ber bîhna wî kes tune bû, ewî jî jehra xwe li ser Seyid de dirêt...

Seyid xortekî bejnî-balî bedew bû.Meriv ji wî,xeberdanê,merîfetê têr nedibû.Lê tu were bavê ber heval-hogira,ber nas û nenasa kur kêm dikir,qerf-nûçik lê dikirin,menihêrî wekî Seyid qirdî-qanix bû.Seyid xwe de dişewitî mîna kizirka ser sêlê,lê çi bikira? ewî çiqasî jî bavê re digot,wekî nelazime ber heval-hogira,ber nas û nenasa wî kêm ke,lê çare li Evdo nedibû.Ev yek wî re ne tenê bûbû xeyset, (xû) lê wisa jî ketibû nava xwîna wî û ewî texmîn dikir,wekî tenê kêm kirina kur êşa dilê wî datîne.

Gava deqekê Seyid ber çava winda dibû,ew derdikeve nava obê û dikire gazî:

- Oro,teşkxur,tu çi kula xwe digerî? hi,nebî qîza digerî? Ê bê mirdarêgeniyo,kê wê te bistîne,kî mintacê te û wê bejna kile-xar e...

... Lê Seyid rastî jî li qîza digeriya.Xortê gihîştî bû,gepîzer.Hevalê wî êdı xweyî yê kom û kulfeta bûn...

Gelek qîzên obê me dixwastin,wekî xortekî mîna Seyid bistandana,lê tenê ne Seyid.Çimkî li çiyaêd me ne xwazil wî evdî,ko navê wî yî zêde hebiya. Êdî ew dibû benîştê deva heta roja mirinê.

Seyîd şivanê pezê nêr bû.Xortekî pê ciriyayî û ser xwe,şivanekî pispor mêrê obê gelekî jê hez dikirin.

- Wele,Seyid,- mêra wî re digotin- wekî wî keftarê bavê te nebiya,te destê xwe bavita kîza me kîjanî jî,nana kirin ji te re tune bû,lê...

Seyid alîkî ve şa dibû,wekî mêrê obê qedrê wî dizanin,lê aliyê dinêde jî ber xwe diket,wekî bavê wî buye aduyê wî...

Êvarekê,wexta pez ber bi guhêrê hat,obê ecêbmayî ma.Seyid re tevayî qîzeke bedewe nenas pêşiya pêz ketibû,dihat.Mêrê obê berda çûn.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

- Seyid,ew kī ye te re? - Apē Hesen jē pirsī.

Seyid soro-moro bū mīna qīzeke kezī.

- Sīnem e...ji oba jorin...

- Qoçax,- mêra hev re gotin,- Mirazē we hev bibe,ser balgīkē kal-pīr bin.

Sīnem mīna kareke xezala ye ji siya xwe bipişke,dūr sekinī bū.

- Būkē can,Apē Hesen nēzīk bū ū çū şērī pē bī - bēpar bī,nan bī -dew bī. Seyid xortekī qoçax e,xebatkar.Gora hevda bin,destē xwe bidne destē hev, bixebitin.Risqē merivē xebatkar kēm nabe.

- De būkē hilde here mal,- Qeymesē īsmayil gote Seyid.Heftekē xwe re vēsa be,seba şivanē mīna te merī ruhē xwe jī nehēvişīne.

Seyid ū Sīnem çūne mal.Evdo ne malda bū.Ew du roj bū çū bū bajêr,penêr bifroşe.Xofeke giran ketibū dilē obê.Gelo wexta Evdo bē wē vē kirinē çawa qebūl ke? wē here bavē Sīnemē re lev bē,yanē wē pêçkē būk ū zavē bigre,bavēje der ve...

Ecēb qewimī.Evdo dengē xwe nekir.Roja dinē çend rīspiyēd obē şandine mala bavē Sīnemē,li hev hatin.Qerez,daweteke sivik kirin ū obe şa bū.Wekī her tişt wisa hêsan xilas bū...

Lē wexta kulfet hêşiya konē Mecītē Īsē berev dibūn ū teşī yē xwe dirēstin, pīrka hacē digot:

- Daē,hişē min alevēra Evdo ū kur nabirī.Evdo merivekī li hev ketiye,tu were dīsa bela pējgarī kur be;qerfnūçka lē bike ū tu were Sīnemē xerīb e, nav-nūçkē Evdo nebe,cih bihēle,here...

- Çawa būkē,- Cem a Ūsif got,- Bila būkeke wisa mala min de biya,çavekī min tune biya.- jina hev re dikirine pore-por ū heyfa xwe yaziya Seyid dianīn.

- Da daē,bextē sēwiya ku hatiye?- Besa şewēş digot,- wekī bextē Seyid hebuya wē şīrē diya xwe tēr bixwara.

Mēra Evdo şīret dikirin,wekī miqatī zmanē xwe be.Berē başqe,niha başqe. Qīza xelkē mala wī de ne.

... Rojekē,nīvro bū.Seyid pez anī dana.Sīnemē ha-hanga kulav danī,av anī Seyid ser çavē xwe şuşt ū destpē kir firawīnē bixwe.Ewī teze parī nan kiribū devē xwe,wexta Evdo mīna cuniya dada hundur.

- Nan te bibe jehra mara,mirdarē-genī,teşkxwur,te bihata pez bida bērī,

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

bila bidota,paşē.Nanē bireviya.Hela devē wī binēre,mīna devē tojenē genī.

Parī gewriya Seyid de ma.Rastī jī ber şilī-şilopa lēvē wī terikī būn. Ew cih de sūcdar bū ū li çavē Sīnemē nihērī.Lē dēmē Sīnemē hatibū guhartinē,çavē wē firībūne qēf (sērī),ū wan çava Seyid re digot,wekī tu badilhewa li vē dinē dijī,wekī tu kērī tiştekī nayē,wekī tu xweliya reş ī...

Seyid texmīn (wer zanī ) kir hesineke ne eyan ji serī hetanī binē pehniya ew şewitand ū xwe ū xwe jī nizanī bū,çawa kire qarīn:

- Bavo...

- Bavo gotiye kul ū ta,- bū hurminiya Evdo,

- Tu zeherē dixwī,lē miyē sor ber bēriyē koriyē de dişewitin.

Seyid nizan bū destē wī çawa destiyē şivdarē guvaşt ū...Evdo li erdē veleziya...

Bū qūre-qūra Sīnemē ū cīnar hedimīne mala wan.Ji serē Evdo xwīna gevez dikişiya ū erd reng dikir.

- Mistiheq,- Apē Hesen got,- Te ruhē gedē belengaz xarī bū,de īcar xwīna xw e de vegewize.

Cīnara pīne (paç) şewitandin,bīso kirine birīna Evdo ū serē wī pēçan.Seyidē feqīr dūr sekinī bū ū ji çavē wī hēsira rē nedidane hev.

Pēy wē yekē re viqīn ji Evdo nedihat.Ew derb bona wī būbū derseke lape mezin,ko ewī nava temamiya emrē xwe de ne standī bū.

- Lē ez qurbana destē te buyī,- pīrka hacē digot,- bēdīna re bēīman lazim e...

sala 1974-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Ew roja sisiya bū,ko evī bajarē nenas de būm.Ji redakssiya ez şandī būm, wekī tevī şēwrdariya jūrnalīsta bim,ya ko wī bajarī de derbaz dibū.Şēwr-darī kuta bū,min bilēta firindē kirrī,wekī roja dinē vegerime Erēwanē.Sūt-keke zēdetir hē mudetē min hebū.Raste,min şuxulē xwe kuta kiribū,lē nedi-xwast vegerime mēvanxanē.De ew qas jī heweskar nīne,tenē orta (navīna) çar dīwarē otaxa mēvanxanē de rūnēyī ū tenē būn mīna zūriyē pēy barana biharē-ye li ser kevira,bīhranīnēd te bikole ū dūē cixarē,ko weedē wisa hevalē te yī tekī tenē ye,kuxte-kuxte te ye ū hēsra ji çavē te jor de bīne.Kē-kī,lē dilē min li tenēbūnē tehemul nake.

Ez nava bajēr digeriyam.Ji dikanekē diçūme ya din,ji sūkekē derbazī ya dinē dibūm,wekī weedē zū derbaz be.Wexta nēzīkī sūka bajarē a merkezīē būm,nişke ve dengekī kulfeta li min tesele bū,ko navē min dida.Ez fikirīm wekī deng ber guhē min ket,vē bajarē dūrī-deraz kē gotī gazī min ke? ez her demekē sekinīm ū dīsa riya xwe de çūm.

- Selīm,- deng dīsa li min tesele bū.

Ez cih de sekinīm.Ser milē xwe yī rastē vegeriyam,bala xwe daē kulfe-teke cahil xwe rast li min girtiye,tē.

Payīza derengī bū.Berfekī hūr hēdī hēdī dibariya.Kuliyē berfēa piçūk nerm dadanīn ser pirça potē wēyī biha.

Kulfet leze-lez dihat.

Rast bējim,ez potēd jinan ī a wī cūreyī hez nakim.Nizanim çima ew fikir serē min de rūniştiye,wekī ew pot mīna qalibē kūsiyane,ko bin xwe de ne t enē bejn ū bala jinē,lē nazkahīya ruhē wan jī vedişērin ū nahēlin,wekī ew ana ber çavē me mēra bi temamiya bedewiya xwe wē bēne kifşē.

Ez wa nava mitalada būm,wexta kulfeta nenas bi devē ken nēzīkī min bū, çeltē destē xweyī rastē da guhaste destē çepē,destē xwe drējī min kir ū got:

- Roja te xēr,Selīm,bē tu aniyī,baranē tu aniyī van aliya.

Me hev silav kir ū min gotē:

- Hazir bibīne,ne bē ez anīme,ne baranē.- Ji vē yekē zēdetir min nikar-bū tu tişt bigota.Min bīhranīna xwe dikolan,lē nedihate bīhra min,ev kī ye? ji ku min nas dike?

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Min destê xwe sist kiribû,lê kulfetê destê min bernedida,dikeniya. kuliyê berfê nerm dadanîne ser porê wê î reş.Por şil bûbû û dilopêd dena reş ser sûretê wê de dihatin."porê xwe derman kiriye" ,-ez fikirîm.

Ewê texmîn kir,wekî ez zûr bûme lê dinhêrim,bîhr naynim.

- Selîm,tu min nas nakî?- beşera ser dêmê wê sar bû.

Ez cih de hişk bûbûm.

- Bibexşîne,- min got,- ez...

- Ez im,mala te nekeve,- ewê ser hev zû zû got û destê min qayim guvaşt.

- Nazê me,qîza porqîçkê Dêresor,te bîhr kiri ye?

Wekî ewê wê demê bigota,ko ez esîla qîzapa te ye bextreş im,ko me du sala pêşda bi destê xwe kire çal,niha ji goristanê têm,diqewime min bawer kira,lê wekî ev kulfeta por reş "qîzka porqîçkê Dêresor e„ min bawer nedikir...

- De bêje- ewê le çavê min dinêrî,- halê te çi ye,zewicî yî,zaro hene... Çawa hatî vira?

Min jê re got,wekî zewicî me,wekî du zaroê min hene,qîz û kurek,hatime vira tevî şêwrdariya jûrnalîsta dibim.

- De bibexşîne,- Nazê got.- Niha weedê zaroya ye,wê ji mektebê (dibistanê) vegerin,ez herim serîkî mal xim,bêm.Tu kîjan mêvanxanê de dimînî?

Min navê mêvanxanê,hejmara otaxa (ode) xwe jê re got.

Nazê destê min guvaşt.

- Cî kî de neçî,ezê eseh bêm te bibînim.

Ew bi gavêd xwe yî hûrik-mûrik dûr ket.

Tenê rêveçûna wê nehatibû guhastinê.

Ez teze ser hişê xwe de hatim.Lê Nazê tevî cimaeta bajêr bûbû û diçû.Dilkê min dikuta û dengê wî tenê min tesele dibû:

"Ku da diçî,qîzka porqîçke Dêresor,xewna mine zêrîn,tu ku da diçî?emirda her bona te min lê dida,bi te şa dibûm;ez gelekî te geriyam,lê min tu nedîtî,niha êdî ku da diçî,ku da?" .

Nazê ber min winda bû.Ez nava mitale û tefekûriyê kûrda gihîştme mêvanxanê û westiyayî li ser cihê xwe veleziyam...

* * *

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

* * *

Oba me warê dagerê danī.Pez kirne tev keriyê ū ez betal mam.Emê weke bīst roja li wira bimana,paşê vegeriyam gund.Oba me nêzīkī zeviyê gênim bū.Me zaroya firīkê gênim top dikir,qerexerman diqeland,paşê me şīlan top dikirin bona çayê,benīştê qanokê hişk dikir,bi gilīkī,sibê hetanī êv arê em nedihatine mal.

Ser çavê me ji pifkirina agirê qerexirman ū firīkandina firīka tenī digirt,lê dilê me şa bū.Rojêd bêxem.Cêb ū paşilê me şīlan ū mormorīk būn,me tirê em dinê de bê xem in.

- Ev mala kê ye,anê,- min ji diya xwe pirsī ko şuxulê xwe kuta kiribū ū ber bi mal diçū.

- Mala Esê Casim e,- diya min got.- Wê bêne gundê me ū hêrs gote min - here ser çavê xwe bişo,çima wisa ketī ser rengê cinawira.

Min ser ū çavê xwe şuşt ū çūme mal.

Ber stêrê me kulavek danībūn ū qīzkeke porqīçke Dêresor rūnistī bū zarokek dabū hemêza xwe.

Porê qīzkê qīçk bū,mīna smêlê genimê kirrik,lê sūretê wê mīna şīlanê sore herfī...

Ez ne hesiyam,wekī ew qīza Esoyê,navê wê Nazê ye.

Min şīlan ū mormorīk kirine badiya mea mezin.- Hineka bide Nazê,-diya min got,kulme şīlan hilda ū derī ve derket.

Min şīlan ū mormorīkê lapê rind nav re bijartin,kire tasê ū ber Nazê danī.

-Bira,şīlan gelek in?- ewê pirsī.

- Çiqas bixwazī,- min gotê.- Em her ro diçin,tê bê yī?

- Wekī diya min bihêle...

- Şīlan jī hene,qerexerman jī,mormorīk jī,benīştê qanokê jī !

- Benīst jī,- çavê Nazê çirūsīn ū min dīna xwe daê,wekī ew mīna şīlanê reş in.

Diya min hat,gote Nazê,wekī diya wê cī (nvīn) daniye dibê bila gede bīne.

Nazê birê xwe da ber milê xwe çū.Wê şevê dilê min de ţiştek dixuliqī (diafirī),lê min nizan bū çi ye.Her min tiştek texmīn dikir,wekī dixwazimsibe zū ron be ū ez Nazê bibīnim.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

...Sibetirê em rabûn,wekî herne şîlana,em teze binya obê ketî bûn,wexta me dît,ko Nazê jî destê birê xweyî çûk girtiye,pêy me tê.Ji qîz û kurêd hevalê me ewê tenê ez nasdikirim û wexta em gihîştine tûmê şîlana û me tûm par ve kirin,Nazê xwast min re hevaltiyê bike.

Me mîna gurê çile careke ve hucumî (êrişî) ser tûmê şîlana kir,min texmîn kir,wekî Nazê nikare biçine.Stiriyê tûmê şîlanê destê wê qul dikirin û destê wê xwînê de sor bûn.

- Tu meçine,Nazê,- min gote wê.- Han torbe bigire û kêleka min bisekine wexta kulma min tijî bû ezê vala kim e.

Pêşiyê Nazê qayil nebû,lê dît,wekî îlaca wê tune,strî destê wê berbat dikin,qayil bû.Ehmedê piçûk dabû pêyî minminîka (pîrik),dora me diçû û dihat,car-cara jî dikire ginegin.

Min tu wexta evqasa zû zû şîlan berev nekirî bûn.Bextê me re tûmê me gelekî rind bû.Şîlanê sore herfî bûn.Wexta meriva hevekî diguvaştin,mîna hingiv destê meriv ve digirtin.Min torbê xwe û Nazê dagirtin û derbazî tûmê şîlanê reş bûm.

- Tava meha Havînê a kutasiyê diqijiland.Xudanê ser min re avitî bû.

- Hinekî vêsa be,-Nazê gote min û pê pêsa şalka xwe xudana eniya min paqij kir.Destê wê hêdî li ser eniya min re şimitî,min tirê dostanê sorkirî danî ser eniya min û ez paşda veciniqîm...

Min şîlan kirine sê para.Parekê Nazê,yeke Ehmed û yeke min.

Nazê nedixwast,wekî em mîna hev parve kin û hela parê bidne Ehmed jî.

- Te zehmet dîtî ye,- ewê digot.- Ez zehf razî me,wekî te min re jî berev kirin,êdî para Ehmed çi ye ?...

Em vegeriyane mal.Me wê rojê ne qerexerman qeland,ne jî benîşt girt,Nazê got,wekî diya wê gotiye dê zû vegere.Wexta Nazê çû,nizam çima,min jî nexwast,wekî bimînim,heval jî bi me re vegeriyan.

- Heyf me benîşt neçinî,- Nazê got.

Min qaba pitikê ji cêba xwe derxist û çûme benîşt raberî wê kir.

Demekê çavê min û Nazê hev nihêrîn û ewê destê xwe drêjî qaba pitikê kir.Min dît destê wê hêdî diricife,mîna dara li ber bê..

- Zehf razîme,- ewê çûmê benîşt hilda û destê xwe zû zûka paşda kişand.

Ez wê şevê dereng razam.Nazê qîzka porqîçke dêresor,li ber çavê min

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

ne diçū.ewē kūra qerexermanē,ko me wē rojē lē nekirī bū,dilē minda dada bū ū pē pēşa şalka xwe pēşdikirē,wekī agir gur be.

Roja dinē em dīsa çūne şīlana,wexta ez ū Nazē ser tūmekī cūda man ū kulma min tijī bū,min xwast valakime torbē,ewē destē min zendē de girt sūretē min ramūsa,torbe avēt ū revī,ez li ber tūmē şīlanē rūniştim;keleke gīrī da qirka min ū min li torbē Nazē nihērī.Torbe wergeriya bū,Şīlanē reş ū sor rijiya būne erdē ū mūrmūrik li ser wan re dibeziyan...

Nazē heftrenga serē xwe vekirī bū,avētī bū ser girmilē,bi her du desta qilīçkē wē girtī būn ū kūre-kūra wē bū,digīriya.Heval,parçekī dūrī me būn.

Ez ber bi Nazē çūm.Ewē xwe avite hemēza min,serē xwe sīngē min ve guvaşt. Paşē bi herdu desta serē min hemēz kir ū mīna baweliya radimūsam.

- Ez te hez dikim,Selīm,te hez dikim!...

Min bi kefa destē xwe devē wē girt wekī dengē wē negihīje hevalan,lē dengē wē ber kevirē çing dadiket ū zinginiya baxir bū.

Me torbē xwe dagirtin,em derketine hēsū yē,lē heval ēdī nedihatine xanē (xuyayē).

- Porē min kur buyē,dūrī Ehmed,- Nazē lez got.- Diya minē min bikuje,-ū revī.

Ez li hēşū yē rūnistim ū min dīna xwe da Nazē,porē wē yī qīçk li ber bē bela-bela dibū,lē dērē wē yī sor,min tirē sone ye ko nişke ve ber piyē min hişyar buye,difire...Ku da diçī porqīçka minē dēresor...

...Nazē ēdī nehate şīlana,ez jī neçūm,em dageriyane gund.Mala wan serē gundī jorīn ji xwe re avayī çēkir.Ez ū Nazē tevayī dersxanekē de hīn dibūn.Min tenē wextē dersa,yanē ji pēş hevala navē Nazē hildida,lē wexta em t enē diman,min jē re digot "qīzka porqīçka dēresor" ū Nazē kincē çi rengī jī li xwe kira lē dihatin,lē gava ji min dipirsī,gelo dērē teze lē tē an na,min digotē,wekī tenē dērē sor li te tē ū roja dinē Nazē Esē dīsa dērē sor li xwe dikir.Nizam çima,serē min de ew fikirrūniştī bū,wekī bēyī dē rē sor Nazē ne Nazē ye.Dersxana me de hevalē me hay ji huba (evīn) min ū Nazē hebūn,lē Tayarē hevalē minī nēzīk carna dikete kirī min ū digot:

Wekī Nazē bibī mala we jī,tuē tenē dērē sor lē kī.

- Eseh,-min got ū em dikeniyan.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Me mekteb kuta kir.Min û Nazê şuxulê xwe da înstûtiya dıxtoriyê (bijîjkî) Nazê hate qebûlkirinê,lê ez der mam.

Ewê payizê kaxeza minê eskeriyê hat.Sibetirê ez çûme înstîtûtê cem Nazê ewê dît,wekî ezî meede kirime.

Min kaxez da destê Nazê.

Min tirê ewê ber xwe keve,lê Nazê şa bû.

- Oxir be,- ewê got,- du sal in,tê herî - vegerî.

- Lê înstîtût,lê tu? - min melûl gotê.

- Mefkire,ezîzê min,Nazê destê xwe bire nav porê min.- Ne înstîtûtê bireve,ne jî ez,

- Ew kenî,- xê silamet qulix ke,vegere ezê alî te bikim.

* * *

... Min rojê du name Nazê re dişandin.Min derheqa hemû tiştî ji werzandinêd sibê zû hetanî razana êvarê Nazê re dinvîsî.Ewê zû zû caba namea min didan û ji namê Nazê jî ez derheqa gundê me,heval-hogira da pê dihesiyam.

Tev min xortekî Ûris qulix (dihewand) dikir.Navê wî Vîtalî bû.Her car wexta min namê Nazê distendin,Vîtalî kêleka min rûdinist û hêvî dikir,wekî jê re tercime bikim.Min tu tişt ji Vîtalî venedişart.Vîtalî xortekî dilnazik bû,dengbêj bû û rind gîtarê dixist.

- Ez xwezila xwe te tînim,pismamê min.

- Ewî her car digot.- Kifşî heye bextê te aniye,şîrhelalek rastî te hatiye,lê Nataşa min,- Melûliyeke xwe dida dêmê wî,- qet namekê ji min re nanvîse.

... Ew du hefte bûn namea Nazê tune bûn,êvarê wexta ez û Vîtalî otaxa me ya razanxanê de rastî hev dihatin,ewî melûl-melûl li min dinihêrî.

- Tunne?...

- Tunne,- min kurt bersîva wî dida.

Min texmîn dikir,wekî Vîtalî ji min geletir ber xwe dikeve.Axir wexta min wî re namea Nazê dixwandin,min zehf rind texmîn dikir,wekî ew wê namê derheqa Nataşê de difikire,rojêd buhurî tîne bîhra xwe û li wan roja ve dijî.Lê niha namea Nazê tune ne,niha ew roj bere-bere têne bîhrkirinê...

Min ji Tayar name stend.Berî vekirina namê min xwe gunehkar kir,wekî heta niha Tayar re nenivîsiye,Bila here derheqa Nazê de pê bihese,Çima namê xwe tune ne?

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Min nama Tayar xwand,destē min piyē min de hatin ū name ji destē min kete erdē.

"Selîm,- ewī namē de nvīsī bū,- ez zanim tu nama Nazē re dişīnī.Edī meşī-ne.Çendekī pēşda yekī înjēnēr (mihendis) hat ew nīşan kir,dibēn bajarekī dūr dimîne.Nazē jī şuxulē xwe guhartiye,wē here wira hīn be..."

Vītalī,ko hatibū hundurē otaxē,zūr būbū li min dinērī,pirsī:

- Mal da qeza qewimiye?

Min hemū tişt jē re got.

Wē şevē ez ū Vītalī ranezan,ewī gītarē dixist ū distira:

Hon jī qīzno,me bīhr dikin,
Ū hez dikin hinke mayīn,
Lē eşqē me hon bīhr mekin,
Ax,şīrîne eşqa pēşin.

Wē şevē li ber çavē min tūmē şīlana būn,zeviyēd genimē kirrik,gundē me ū qīza porqīçke dēresor,ko nava rē yēd bīhranīnēd min re diçū,mīna so-neke (navē tēyrekī) ji meriva vecinîqe,bifire...

* * *

... Min qulixkirine xwe ye eskeriyē kuta kir ū vegeriyame mal.Gund de ez pē hesiyam,wekī mala bavē Nazē jī ji wira bar kiriye,çūne nava qewm ū pismamēd xwe.Ez wisa jī li ser rēça Nazē venebūm...Lē îro,wexta deh sala z ēdetir derbaz buye,gelo ne xewn e,wekī min Nazē dīt.

Ez weha di nava fikir-mitalada būm,min her tiştek texmīn dikir,wekī di-lē min li vē rasthatinē, ko wan salēd pēşin de ez ewqas hewce būm vē şa būnē.

Min tirē ez ku jī Nazē bibīnim,ewē mīna berē be,porī qīçk,mīna smēlē genimē kirrik,sûretē sor,dērē sorī wē le be...Lē Naza min îro dīt,ew nīn bū,na,ne qīza xewnēd min a zērīn bū...

Hēdīka sē caran derī kutan.Min derī vekir.Nazē hate hundur ū xwe re bī-na gulavēd Fransiyaē biha anī.

- Bibexşîne,- wekī derengī ketim,- ewē çentē destē xwe giran danī ser textē.- Heta min xwarina zara daē,heta tivdareke xwe dīt.Reşīt jī ne li m al e,- ewē giran nefesa xwe kişand ū potē xwe ēxist.

- Reşīt mērē te ye ? - min jē pirsī.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

- Erê,- ewê li çavê min nihêrî,- înjinêrê neftê ye.Salê deh roja li mal da namîne,niha jî çuye şimalê (bakur).

- Çend zaroê te hene,Nazê? - min hêdî jê pirsî.

- Dudu,du kur:Seyid,Rizgar,yek heyşt saliye,yek jî heft.

Me demekê xwe kehr kir.

- Tu aqas jî nehatî guhartinê,- Nazê gote min.- Tenê hinekî kok buyî.

Em herdu jî kehr beşerîn.

- Min bîhr kir,niha birçî yî.- Nazê rabû ser xwe û çenta destê xwe vekir,xwarin,botilge qonyak danî ser textê.Fîncan anîn,şûşa qonyakê vekir û kasê me dagirtin.

- Eşqa rasthatina me,- Nazê kase xwe hilda,kasea min xist û carekê de ser xwe de kir.

Destê min lerizî,mîna wî çaxî,çaxê Nazê destê xwe drêjî qaba pitikê kir,wekî cûmê benîşt hilde.

Min kehr vexwar.Sûretê Nazê bere-bere sor bûn.

- Çima kêfa te xwaş nabe,- Nazê gote min.

- Tu şa nabî bona rasthatina me?

Min xwe kehr kir.

Nazê dîsa kasê me dagirtin.Min texmîn kir,wekî çavê min nava vê kulfetê de dixwazin tiştekî bibînin ji wê qîza porqîçke dêresor,lê tu tişt tune,tu tişt,û dilê min bere-bere şa dibe,wekî tune...

Nazê kasea xwe vexwar û gote min:

- Min ramûse.

Min destê xwe histuyê Nazê re kir,lê germayî ya berê tune bû.Min tirê min destê xwe daniye ser bûzê.Nazê serê xwe danî ser milê min.

- Tê bîhra te,- Nazê got,- wexta me şîlanê reş dixwarin û te ez ramûsam d ewsa ramûsana te ser sûretê min mabû,me jî texmîn nekiri bû.Ez cûme мal,diya min dît û min "hevrîşkeke" çivir xwar.Min te re negot.Wê rojê şûnda diya min nehişt,wekî wekî ez herime şîlana.

Otaxê de bere-bere bû tarî.

- Zaroê te ê mal de bitirsin,- min gotê.

-Bnam hatiye mala me mêvanî,- ewê got.- Lewma min tu nebirî mal.

Ez kehr cihê xwe de rûnistim.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

- Xewa min tē,- Nazē got.- īzne hebekī serē xwe deynim.

- Kerem ke,- ez ber bi derī çūm.

- Neçe,- Nazē dey li min kir.

Ez demekē sekinīm,min tirē lingē min erdē ve hatine dūrinē.

Ez derketime der ve.Berf hē dibarī.Min eniya xwe sparte pencera sivderē ū li kuliyē berfē nihērī.Ewana nerm,nazik dadanīne erdē...

Min bihīst,wekī yek nēzīkī min dibe.Vegeriyam,Nazē bū.Ewē desmala xwe çavē xwe ve guvaştī bū ū hēsrē wē rē nedidane hev.

- Bibexşīne,Selīm bona rojēd buhurī.Ez zanim dilē te yī temīz e,- ewē kaxezek drējī min kir.Eva tēla mala me ye,eger weedē te hebe,tēlē xe ū kaxez kire beriya min.

Sivderē de bū reqe-reqe pehniyē sola wē.Nazē diçū...

* * *

Firinde bilind,zehf bilind difirī.Biniya me de ewrē spī mīna kerī pezē qerqaşī xwēdayī ber bi avē here,dikişiya.Min pencera firindē re li roē dinihērī,ewē penca xwe dakutabūne ser ewra ū ewr dibiriqīn.Min tirē li ser wan ewra tu rūniştī,qīza porqīçke dēresor,rūniştī ū ber bi xewnēd minē zērīn diçī...

Tu xewna minē zērīn ū ez tu wexta,tu cara nahēlim kes te biherimīne...

sala 1976-a.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Seyîd çû otaxa profesor.Profesorê kar rûniştî bû,bi her du desta dêmê xwe sepe kirî bû û keti bû nava mitalêd kûr.Ewî carekê ve hatina Seyîd texmîn nekir.

-Selam,profesor,-dengê Seyîd te tirê ji bîreke kûr hat.

Profesor kûr û dûr berçavikê xwe re li Seyîd nihêrî û hêdî serê xwe hejand,silava wî wergirt.

Seyîd tu cara profesorê nasê xwe wîsa melûl û westiyayî nedîtî bû.Ew te digot qey carekê da kal bûye,girmilê wî danizmîne û berçavik pejmûrde ketne ser poz.

Wextê çav li Seyîd ket,destê profesor lerizîn û bona Seyîd xemgîniya wî texmîn neke,destê xwe pişt dexla sendaliyê da veşartin.

-Qewata min der bû,Seyîd,-Lêvê profesor encax li hev çûn û hatin...

Ewî dît çawa du histêr ji çavê Seyîd gulol bûn,ketine nava ruyê wî yî ne kurkirî.

Profesor giran ji cih rabû.Seyîd dît,wekî ew serda -pêda dilerize,mîna dareke palûtê ye ser alqeke mayî li li ber werzebaê payîzê.

-Zarê wê î nemînin Seyîd,-profesor hêdî ber.bi derî çû,-naê qenckirinê Xwîna wê... Îzna wê tune bîne...Zara bîne jî wê nemînin.Min çar sala pêşda tera gotiye.Rizqê wê tune.Çima dikevî ber gunê xwe jî? Dinêrî,eva cara sisiyane,hon vê ecêba giran li ber çavê xwe dibînin.

-Çi şêwrê didî profesor ? -Seyîd mîna gunekarê ber dazdaniyê bisekine,-Pirsî. Profesor demekê li ser milê xwe re vegeriya ser Seyîd,bi destê rastê berçavikê xwe edlandin û got :

-Çi hêvî Seyîd,eger naxwazî bê zuret bimînî,çiqas zû ewqas baş.-Profesor dı derî ve derket.

Seyîd tirê nava mêjû yê wîda bombe teqiya.Dinya dora wî zivirî û ewî encax xwe zeft kir,wekî nekeve...

Seyîd derket.Xeberê profesor mîna kêra destê wî mêjû yê Seyîd dibirî. "çi hêvî ". "çiqasî hêsa dibêjî ,profesor,"-Seyîd bi xwe re difikirî.-Na,profesor,ew yek nabe,tu wexta nabe,bila bê zuret bim.Ew ne qar e,qar ew e wekî merî xwe û xwe ji emrê xwe,ji rojêd xwe yên buhurî,xwe û xwe ji xwe çi hêvî...,,.

Seyîd çû sûkê,wekî Gulîzarê re xwarinê bibe nexwaşxanê.

www.netewe.com

...Gulīzar qīza cīnarê wan bū.Berxê salekê būn.Rojêd zarotiyê de çiqas tevayī "mal-mal,, "çavgirtinok,, "pīncokī„ "Līling„ Līstibūn.Tevayī jī çūne mektebê,cer kursīkī rūdiniştin...

Wana nizan būn sal çawa derbaz dibūn.Rojekê jī dê ū bavê Gulīzarê qirar kirin,wekī mala xwe barkin,herne bajarê Tilbīsê,nava qewm ū pismamêd xwe.Gulīzar ū Seyīd hingê koma neha būn.

... Ew roja kutasiyê bū,ko ewana dersxanê de kêleka hev rūniştī būn.Seyīd nedixwest,wekī zengilê navberiyê lêxe. "xwezil evê demê heta-hetayīê bikşanda,-Seyīd difkirī,-Awa kêleka hev rūniştana ū tu kesī em ji hev neqetandana...„ .

Lê zengil wextê xwe de kire zingīn.Gulīzarê aliyê diwêr rūniştī bū. "Xwezil Seyīd ji cih ranebuya,-ew difikirī.-Em pênc deqa ji kêleka hev rūniştana„ ... Lê Seyīd rastī jī ji cih ranebū.Hevala der ve gazī Gulizarê kirin,lê ew ji cih neleqiya.

Kêfa Seyīd tunebū,ewī zanibū,wekī zū ve huba wī ū Gulizarê firiye dilê hev,Lê herdu jī şermoke būne,sirr a xwe hev diyar nekirine."Gulizarê sibê here,-Seyīd difikirī,-gotī jê re bêjim„ ."Seyīd dimīne,-Gulīzarê belg-e kitêba ber xwe werdigerandin,giva dersê ber çavê xwe re derbaz dike,-gotī bêjmê„ .

Zengilê dersa berī kutabuyīnê lêda.Çil ū pênc deqa şūnda evana ji hev biqetiyana.Dersalīteratūraê bū.Kara dersdar gelekī ji Gulizarê hez dikir. Lewma jī ewê wê rojê ders derbaz nekir.hêvī ji şagirta kir,wekī ker bin. Ewê gazī Gulizarê kir ū hêvī kir,wekī tenê ezberiya bêje.Koma wan da kesekī mīna Gulizarê ezberī nedigotin.

Dersxane ker bū.Qibe-qiba dengê Gulizarê bū mīna dengê çivīka baharê ye ko hêlīna xwe dihūne.Şiêrêd derheqa hub (evīnī) ū hezkirinê de mīna gezoê jī lêvê Gulizarê dibarīn.Ewê,xwezma,şiêra (helbest) "dar şêrīne berê xwe ve „ Rind digot.Ū kesī nizan bū,wekī ew helbest Seyīd nvīsiye. Ew sirr a wī ū Gulizarê bū.

Dersxane sekinī bū.Dilkê Seyīd lêdida mīna hespekī pirbezayī firna bikute.Zengilê kutasiyê kire zingīn.Mekteb ser hev re çū.Lê dersxana nehada tu kes nedixwest ji cih bileqiya.

Heval ū Gulizar hatine ruyê hev,xatirê xwe ji hev xwestin...Seyīd ū

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Gulizar mīna her car dīsa tevayī ber bi mal çūn.Seyīd destē xwe kiribū cēba xwe.Kaxeza ko ewī wexta dersē nvīsī bū,destē xwe de mist dida ū difikirī: "bidmē an na ? „...

Ewana xew nīzīkī malē kirin.

-Gulizar,- Seyīd cih de sekinī.

Qīzikē li wī nihērī.

Seyīd kaxeza cēba xwe derxist,daē ū lezand...

* * *

Wē ēvarē Seyīd li bin dara bīyē serē bexçē wan sekinī bū. Wē bē an na? Kaxeza, ko ewī nvīsī bū,hat berçava."Gulizar,ez te hezdikim.herko tu jī min hez dikī,ēvarē seata neha were serē bexçē me,bin dara bīyē. Seyīd„ .

Seyīd xwe gunekar dikir,Wekī gelekī kurt nvīsiye.Gotī nameke pak binvisiya.Heyīna dilē xwe jē re şīrove kira.Hema hilda careke re kurt-Kurmancī nvīsī :" Ez te hez dikim,tu jī min hez dikī ?.„ Seyīd gelekī fikirī ū hate ser wē fikrē,wekī ji wē yekē zēdetir,bixwasta jī,nikarbū binvīsiya.Çimkī Gulizarē rind ew nas dikir mīna pēnc tiliyē destē xwe ū tiştē teze wēre şīrove kę,ewī texmīn kir,wekī cayīz nīne.Seyīd weha nava mitalē de bū,wexta Gulizar hat...

...Ewē şevē ewana bin dara bīyē de gelekī rūniştin.Herduya jī zanibū wekī gelek tiştē wan heye,ko hev re bējin,Lē te qey digot bīhrkirine, wekī ruhberin ū zmanē wan heye.

Hīv li ser serē dara bīyē re sekinī bū ū te digot qey guh dide dilē bengī ū derheqa padişē xwe-Roē de difikire.

Gulizar ji cih rabū,dara bīyē hemēz kir ū gote Seyīd:

-Tē vē darē hiz kī ?

-Dar şīrīne berē xwe ve,-Ū ewī Gulizar hemēz kir,hēdī darē ve guvaşt.

Hīvē perda ewra da navīna xwe ū dinyaē.

Evīn şīrīne berē xwe ve...

Gulizarē bi xeberēd guhastī ve helbesta Seyīd ezberī got.Ū wana cara pēşin texmīn kir,wekī çawa evīn diafire...Wē şevē ewana derheqa wan rojan da difikirīn,wekī wē timē hev re bin.hela navē zaroyēn xwe jī lē kirin: Elī,Karē.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

-Tu zaroē me hez dikī,Seyīd? -Gulizarē hēdī pirsī.

Seyīd Gulizar hemēz kir,ser çoka xwe da rūniştandinē ū got.

-Weke zara ezē tenē diya zaroka hez dikim.

* * *

...Hema wana zū be zū hev re diçūn dihatin,Ewan hema mīna pireke ne a-yan du dilē bengī dūr ve hevre didane girēdanē.

...Du sala şūnda Gulizar hate Erivanē.Ew ū Seyīd ve ūnīversītē (zanīngeh) de hatine qebūl kirinē.Hisret ū cehfē du sala hatine bīhr kirinē ū ewana bawer jī ne dikirin,ko du sala dūrī hev būne,wekī nava wan sala de tenē bi nameyan hay ji hev hebūne.

Gulizarē timī derheqa dara bīyē de dipirsī.Ewē dixwest pē bihesiya gelo xeberē bin darē da bīhra Seyīdde ne,an na.

Seyīd digot,Wekī dar dewsa xwede ne ū hēvīyē ye,wekī kengē dīsa wē herne "sertēdana„ wē.Ewī ji Gulizarē vedişart,wekī sibekē rabuye dīna xwe daye ko bavē dara bīyē biriye.Çimkī ewē li ser mēw ē tirī yē dikire sīh ū tirī rind nedigihīştin...

* * *

...Pēy kutakirina ūnīversītē re Seyīd ū Gulizarē hev stendin ū bajērde man.Seyīd kete aspīrantūraē (bijīikī ),lē Gulizar bū dersdar.Ewana bē-sebr hēviya zaroyē xweē pēşin būn.

Seyīd didīt,wekī Gulizar çawa tivdarekē zarē dike.Dergūş aniye,paçika hazir dike.Lē... zaroē pēşin nebū qismetē wan.Karē heft mehī de nexweş ket,mir.

Zikē didua de Gulizar giran nexweş ket.Tixtora re encax li hev hat, wekī emrē wē xilas kin.Hingē profesor Seyīd re got,wekī Gulizar gotī ēdī zaro neyne...

* * *

...Çendekī şūnda Seyīd Gulizar anī mal.Ewī texmīn dikir,wekī Gulizar vē carē zehf belengaz buye.Lē ew ber dilē wē de dihat,her tişt dikir, wekī Gulizar berxwe nekeve.Seyīd texmīn dikir,wekī ev derba girane di-duwa īcar dilē Gulizarē girtiye."diqewime profesor jē re gotiye,wekī zaroē we ē nemīnin? Na,profesor nabēje,ew ne merovekī wisa ne,-Seyīd difikirī.-Min lavayē xwīna wī kirine.Ew nabēje„.

Gulizarē ji Seyīd hēvī kir,wekī wē çendekī bibe mala bavē wē.Ewē gilī da,Wekī wē berxwe nekeve ū her tiştī bīhr ke...

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

* * *

Mehekê zêdetir derbaz bûbû.Seyîd hêviya Gulizarê bû,lê Gulizar nedihat Rojekê jî,wexta Seyîd hate mal,dîna xwe daê nameyek paş dêriye.Ewî pêre pêre destnvîsara Gulizarê nas kir.Şa bû,name sîngê xwe ve güvaşt û serê xwe hejand.

-Lê Gulizara min,te çima adrêsa (navnîşan ) vegerandinê nenvîsiye.-Name vekir,kaxez ramûsa û xwend:"Selam seyîd can.Bibexşîne,ezîzê min,wekî dewsa hatina min,tera name dişînim.Çimkî,texmîn dikim,wekî hatina min êdî ne cayîze.Ez bêbextim,naxwazim tu jî ruyê min de bêbext bimînî. Min wisa jî zani bû,wekî tu tiştekî zanî,lê naxwazî li min re bêjî.Ez Tilbîsê çûme ser tixtor û her tiştî hesiyam.Ezê tu wexta zaro ya nedime ber milê xwe.Xwîna min hilnade,lê te min re nedigot...

Yaziya min jî wisa ne.Tê bîhra te dara bîê a serê bexçê we?Te ez dixapandim,wekî dar dewsa xwe de ne.Wexta cara pêşin ez hatime mala we min dît,wekî dar birî ne.Çimkî berê wê tune bû û bi hebûna xwe ve ew nahêle tav bigihîje rezê başqe (bê avî ),wekî berê wan bigihîje.Kulfeta mala min jî dara bê ber e.Tê bîhra te helbesta te a "Dar şerîne berê xwe ve„ ?Rastî wisan e!Kêra lazim in darêd bê ber.Çiqasî jî ew bedew bin,Hez kî rewşa dinê,yek e,tu tiştê wan tune ser emirda zêde kin. Û eger meriv wan dinerin,dinêrin wekî tenê bedewiya wan ve hijmekar bimînin Lê bedewî jî,çawa eyane,heta-hetayê namîne,ew jî tê guhastinê...

Ez zanim tu ecêbmayî bimînî,wekî min navnîşana vegerandinê nenvîsiye. Tê bêjî xwe re nedîtiye? Na,ezîzê min.Niha ez êdî Tilbîsê namînim.Merivekî roja minda rastî min hat,Kulfeta wî miriye û du zarê biçûk sêwî hiştine.Niha ez mala wî de dimînim.Zanim çi xweşbextiye,Seyîd,wekî gava zaro gazî te bikin "Bnê „ Tu jî,wekî bibî bav,tê şîraniya wê yekê texmîn kî.Mêrik xortekî gelekî heyf e.Me navê zarê wî guhastin û danîn:Elî û Karê.Tê bîhra te min û te qirar kiri bû,wekî van navan zaroê xwe kin.

Seyîd,ezîzê min,hêvî,reca (tika )ji te dikim min bîhr ke û zû bizewice.Yazi li ser bextê min rûnişt,l-e min nexwest li ser bextê te rûnim. Ez tu wexta te bîhr nakim,hetanî ruh ber qefesa min de hebe...

Tenê hêvîke min ji te heye,gava dizewicî û silametî zaroyê te hebin navê wana bîhr nekî:Elî,Karê.

Bi silava Gulizar„.Seyîd ker li ser dîwanê rûnişt.Pakêt çerixand û li ser mohr a wê xwand-Bajarê Batûmê ye„.Raste,derva hê ronkayî bû,lê ber çavê Seyîd bû şevereş û ew ber bi dîwêr çû,wekî lambê vêxe.....

sala 1975-a

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

- Were em îro herne gundê me,-Te melûl li min nihêrî.-Îro yekşem e,karê te a mayîn jî tune ne.

Min çavê te da hesreteka kûr û nebuhurî dît ber bi meskenê (avahî)zarotî û cahiltiya me.Û min nexwest xatirê te bişkînim.Em bêjin min tu wexta xatirê te neşkandiye,xwazma van mehêd axiriyê de,çaxê dibînim,wekî tu dereceke tengda yî.

-Axir tu duhalanî,-min çavê te nihêrî.-Rê dûr e,-min ber xwe de got,-wê bona te çetin be.

-Çetin nîne,-dengê te de daxazî hebû,-Em herin,xwe te bîhr nekiriye? Îro deh salê qirara me temam dibin.Ez çi zanim ezê îcar xilas bim,an na...

-Bêhişî xwe xeber nede,-min hêrsa xwe rakir.

-Ev çi giliye te re buye xişm,xilas nabim,ha xilas nabim,xwe tu ne zaro yî.Paşê jî xwe tu kulfeta pêşin nînî.Ew rê pêşiya her yekê ye.Bona te xwe ne cara ewlîn e,wekî tu ditirsî?

Te dengê xwe nekir.Çavê te demekê li min nihêrîn û te serê xwe berjêr kir.Ser bengzê (gwîn) te min hesreteke bê sûc dît û ez teslîm bûm. Hinekî şûnda min avtomaşîna meye "Jîgûlî„ derxiste ber derî û em ber bi gund leqiyan.Em diçûne gundê me,ko deh sala pêşda em jê dûr keti bûn. Em diçûn ber bi meskenê zarotî û cahiltiya xwe,ber bi serkaniya heyetiya (hebûna)me...

Tu kêleka min rûniştî buyî û te bi çava menzila (dûrahî) rê dipîva.

Avtomaşînê rê radiçand.Her car,wexta berê xwe didime gundê me,dilê min de bêhemdî min bîhranînêd zarotiyê hişyar dibin,mîna belgêd kitêbeke gelekî heweskar zû zû ber çavê min re derbaz dibin û ez pê re nagihînim texmîn kim.Lê ko zarotiya min destpê bû û li ku kuta bû.Tenê ez tiştekî zanim,wekî gava berê xwe didime gund,hesîn-hesreteke kûr ko ez wextê mayîn texmîn nakim,dilî min disoje...

...Zaritiya min tê ber cavê min.Demekê.Kurkekî reşotankî,zilamekî porkurîsk li ser loda giyê,yanê hafa gêlî rûniştî,kitêbê dixwîne.Lê qîzikeke porqîçk,çavê sût mîna ezmanê tas,şivêta minminikekê dor wî diçe tê,zmanê xwe derdixe û ruhê wî de dilîze.Kurik ser qîzikê de hêrs nakeve.Kitêba xwe dide wê û peyayî gelî dibe.Hinekî şûnda vedigere,paşlê û cêbê (berik) de gûz sincê biyanî,bîvok,şîlan...

www.netewe.com

-Kur-qīz çi ferqī,-min destē xwe bire nav porē te.Ewled-ewled e!

-Ez jī zanim ewled-ewled e,-te destē min danī ser kefa destē xwe,-bona dē ferqī tune,lē bav kura hez dikin!

-Efsenetiye,-min got,-min qīza xwe hez dikir.

Te xwe ker kir.Hēja min texmīn kir,wekī min birīna teye kevn ēşand ū hiştēreke germ ji çavē te gulol bū,kete ser destē min.

Me xwe ker kir.Otomaşīnē rē dipīvīya.

-Hingī em gund derketine,tu çend cara çuyī?-te ji min pirsī.

-Du-sē cara,-min caba te da.

-Lē ez rast īro deh sale neçūme,-te ber xwe de got.-wexta diçuyī,-te berē xwe da min,-diçuyī gēlī ?

-Ne qirara me heye,-min caba te da,-deh sala carekē em hev re meskenē zarotī ū cahiltiya xwe.

-Sal çiqasī zū derbaz dibin,-te got.-Min tirē duhī bū...

Tu ketī nava mitala.

Nişke ve dīdema gund ber me vebū.Dūr ve topē "kaniya sor„ hate kifşē ū gund mīna miqnatīzē em ber bi xwe kişandin.

-Aliyē rastē dagere,kuda diçī,-te milē min girt.

Demekē min tirē ez ji xewē şiyar būm.Rastī kuda diçim?Deh sale em ji gund derketine.Niha ne mala me wire,ne mala bavē te,ne jī malēd meriyē me...

Min otomaşīn aliyē rastē dagerand,ber bi gēlī.

Fēza Kefrē "zingzingo da„ em sekinīn.min derē otoyē vekir,alī te kir wekī peya bī.Em hēdī daxilī gēlī būn.Çūn ū ser Kefrē "zingzingo„ rūniştin.Tava payīzē şīrīn būbū ū ji kevir germayīke xweş dahat.Hetanī binē gēlī du gav būn.darē payīzē zer wergirtibūn ū belgē wan diweşiyan.Xuşexuşa çemē zenguyē bū,çawa ko deh sala pēşda.Ewē roja payīzē,wexta vira li ser vī kevirī,me fehm kir,wekī emē hēdī gēhīştine ū me soz da hev,wekī emirda timī tevayī bin ū deh sala carekē bēne vira,li meskenē zarotī ū cahiltiya xwe...

Te gustīla tiliya xwe derxist ū hēdī kvir da."zingzing„ bū zinge-zinga kevirē "zingzingo„ ū rojēd cuyī hatine bīhra me...

...Paşē ew xortē reşotankī por qurişk ū qīza porqīçke çav sūt mezin būn.Būne qīz ū xort.Lē evīna wana,ko ji zarotiyē hebekī vir de destpē

www.netewe.com

-Hēdī bajo,-te destē xwe danī ser destē minī rastē.-Leznekeve,axir...

Te xeberē kutasiyē negotin.Min fehm kir tu çi re dibējī û baē avtē (otomaşīn) sist kir.

...Qīzika porqīçke çav sût,gûz,sincē biyanī,bīvok,şīlan dikirine pēşa xwe,çavē xwe digiritin û sûretē xwe nēzīkī kurik dikir.

-De...

Û qīzik dilerizī mīna xweşxweşika ber bē.

Kurik sûretē wē radimīsa.Ew bû heqē wī.

Qīzikē çing dida mīna berxika virnī û digote kurik:

-Lē tu,tu kesire nabējī?

-Tu kesī re,-kurik mīna mērē mezin bersīva wē dida.

-Sibē jī ezē bihēlim tu min maç kī,-qīzkē digot û direviya mal...

-Çi difikirī,-te min nihērī.

-Nafikirim,-min hinekī dereng bersīva te da.

-Lē min texmīn kir,wekī tu difikirī,-beşerek ser dēmē te peyda bû.-Naxwazī bējī?

Min zani bû,wekī tu xeyīdīyī.Min xwe ker kir.

-Ez bējim tu çi difikirī?-te destē xwe danī ser destē min.

-Bēje,-min demekē te nihērī.Û cara pēşin texmīn kir,wekī nava rojē axiriyē de dēmē te çiqasī hatiye guhartinē.Te poz daxistiye,çavē te kortē de çûne û sifetē te qey dibējī drēj buye,arē gewr xwe avitiye ser çavē te."wekī eva qīztī wiha biya,teē hiz kira?„.-Nişke ve dilē min de dengekī ji min pirsī.Min tirē te ew deng seh kir.Min kēleka xwe de ker (bi dizī ) te nihērī û dît,Wekī te destmala xwe derxistiye,neynik (hīlī ) daye ber xwe û arē ser çavē xwe paqij dikī.

Min destē xwe danī ser milē te.Te li min nihērī û dengē ko hēja dilē min de ji min pirsī bû,xwe û xwe jī cab (bersīv ) da: "Ne mana vē yekē xweşbextiya te ye jī...„

Û cara pēşin bû,wekī min xwe û xwe gunekar kir.

-Te ne got,ez çi difikirim,-ez keniyam û min xwest te ji nava mitala derxim.

-Tu difikirī,-sorankē xwe da dēmē te,-kur ē me re bibe an jī qīz?...

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

bûbû,ew kiribûne ruh û qalibek...û wana fehm kir,wekî emir da dûrî hev nikarin,tu wexta nikarin bijîn...

-Binêr,-nişke ve te kêleka kevir nişanî min kir.

Min jorda nihêrî,dareke sincêye biyaniye biçûk bû,ko teze nikand ni-kandî bûn.Sincê pê ve birî bûn,tenê du libê herifî nava belga de mabûn.

-Tê bîhra te?-tu keniyayî.

Ça naê bîhra min? wexta ez ew kurkê reşotankî porkurîşk bûm,lê tu qîzka porqîçke çav sût,min jî te re darê piçûk kokê de radikir,dianî. me sinc dişêlandin,lê dara piçûk nava xwelîê de dinikand (vedişart,an dikir çalê ) wekî mezin be bibe bax û wexta me didît,wekî robiro darê me hişk dibin,em ber xwe diketin.(xemgîn dibûn )Me hingê nizanbû wekî dora kevirê "zingzingo„ tenê qatek xweliye,lê binda kirîşe û sel û dar tu wexta nagirin.

Gelo ki ye ew kurik,ko bê şik dara sincê hezkiriya xwe re aniye,sinc şêlandine û dar nikandiye? Tu kî bî jî pismamê nenas,wekî îro ya sibê bêyî,binêrî,wekî dara we hişk biye,ber xwe mekeve.Ew ne ko ji dilsari-ya evîna we ye,wekî dara sincê hişk biye,lê ji xweliya dora kevirê " "zingzingo ye„ 'kîjan qateke,lê binda kevirên kiris...

Ez ji cêba xwe qelem (pênûs) û kaxezê derdixim,wisa jî dinvîsim û çiqlê darê ve dikim.

Tu jî dixwînî û dikenî.Em kevirê " zingezingo„ nihêrîn û diçine nav baxê gêlî.Belgê daraê zerbuyî bin lingê me de xişexiş û em li ber dara meye sincdarê disekinin...

...Kurkê reşotankî porkurişk tê ber çavê min.Bûbû xortekî qemerî bejn-bilind û li ser koka dara sincdarê bi nukulê kêrê herfê (tîpê) navê x xwe û qîzka porqiçke çav sût,ko bûbû qîzeke bedewe xamaye gêhiştî û li kêlekê sekinî bû,dinivisî...

-Ku ne navê me? -te ji min pirsî.

Min çavê xwe li koka spîn darê gerandin.Gelek navê teze hatibûn nvîsa-rê.Nenas bûn.Ji navê keviya min tenê du nav naskirin: "Elî,Besê„ .Elî hevalê min î zarotiyê bû.Ewî Besê hezdikir.Lê qîzikê caba huba wî ne da û çawa bîhranîna rojêd buhurî tenê ev navêd nvîsandî mabûn: "Elî,Besê„ Me navê xwe encex nas kir,diha rast tenê herfê pêşin û kutasiyê(dawiyê) mabûn.Dara spîndari qalçikê (qaşik) xwe guhastî bû.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Em çūn li devê çemê Zenguyê rūniştin.Xuşe-xuşa çêm bū.Deh sala pêşda bū,tê bīhra te,çemê min ī delal.Dīsa em wa li kenarê (kevī) te rūniştī būn.Ez būbūme xwendekar,hatibūm,wekī xatirê xwe evê qīzê,te,gêlī,dara spīndarê ū kevirê "zingzingo" bixwasta.Nizanim hingê hon,çemê min ī delal,dara minê spīndarêye nebirkirī ū kevirê "zingzingoyī" hizkirī,melūl būn,ya na,nizanim,çimkī ez emanê we nizanim,Lê ev qīzka melūl bū. Melūl bū,çimkī emê her êvar tevayī nebūna mêvanê we,em ji hev dūr diketin,ez diçūme bajêr,ew gund de dima...

-Em herin, -te nişke ve gote min, -Pişta min,êşiya. -Min destê te girt ū em hêdī hilkişiyan.

Hingê jī,tê bīra te,em wa tevayī hilkişiyan,min destê te girtī bū. Deh sala pêşda.Gelo hebe,wekī em dīsa tevayī vê rê va hilkişin,tu kelegīrī buyī.Min destê xwe stuyê te re bir,ber dilê te re hatim,wekī timī,hema gava weedê min hebe,ezê bêm ū emê tevde peyayī gelī bin.Lê hingê,cara ewlīn,te min re got,wekī mala we dixwaze ji gund bar ke... ...Wê êvarê jī mala me tu nīşan kirin.çendekī şūnda wê ji gund bar kir... Sala dinê mala me jī cih guhastī bū.ū meskenê zarotī ū cahiltiya me dūr ma,mera bū xewn...Ū me qirar kir,wekī deh sala carekê roja nīşankirina me,bibine mêvanê meskenê zarotī ū cahiltiya me.

...Ū niha em li vir in,li serkaniya heyetiya xwe.

-Bilezīne, -nişke ve reng ji te çū, -halê min xira be.

Em ber bi bajêr vegeriyan.Min dixwast ser te da hêrs ketama,wekī te ev riya dūr da pêşiya xwe lê...Min qêmīşī (berketin) te ne kir.

- Bajar dūr e,- te gote min,- ber bi nehiyê bajo.

Em çūne nehiyê.Rokurtikê Payizê būn ū tariyê bere bere erd hildiçinī. Wexta em gihīştine mala welidandinê.Du kulfet ketine bin milê te ū tu birine jorê.Ez jêrê mam ū min texmīn kir,wekī xofeke ne eyan kete dilê min ū ez jī tirsiyam bona emrê te.(jiyana te) Eva zikê diduyane.Zikê pêşin de tu zeyītī çūbūyī mala bavê xwe ū wira jī razayī.Ez pê hesiyam,wekī encax doxtira ra li hev hatibū emrê te (jiyana te)xilas kin. Ū niha tirsa te ketiye dilê min jī.Ez heyatê da bê sebr diçim-têm ū çavê min li riya dêrī ye.

Tu bes tune.Heyatê da êpêce meriv berev būne.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Dergevana pīr car-cara dērī vedike,navē yekī hildide,çavronkayī dide ū dīsa dibe xirpiniya kilītē.

Aha otomaşīneke "Volga„ tē rast ber dērī disekine.Xortek şa-şa jē peya dibe,dērī dixe ū kinca dide dergevana pīr,navē kulfetē "Palatē" dibēje.Hinekī şūnda kulfetek pēçekī ber mila derdikeve derīda,peyī jī yekī cahil kubar-kubar tē.Xortē bextewar pēçekē ji hemēza kulfetē hildide.Zara radimūse ū şa-şa ber bı otomaşīnē tē.

Merivēd ko heyatē da sekinīne bi beşera xweş wī xortī rē datīnin.

...Ū nişke ve tē ber çavē min.Du sala pēşda bū.Min cihē xebatē da tēlēxram stend,wekī tu razayī ū mera qīzek buye.Şabūna min bē hed ū hesab bū. Wē demē min tirē ez merivē dinyayē lapī (pir) bextewar im.Ez būbūme bav! çi bextewarīke mezin!ez hatime mala bavē te.Sibētirē wē tu bişandana mal. Ū aha em ber derē mala welidandinē sekinī ne.Nişke ve dinērim tu tē yī. Pēçek (li paçika pēçayī zaro ye ) ber milē te ū ez teze fehm dikim,wekī dinyaē de xweşbextī çiye...

...Nişke ve navē min hildidin.ez ser hişē xwe de tēm ū dinērim,wekī dergevana pīr e,gazī min dike.Ez lez diçim.Ew nava pīnekī spī de tiştekī girēdayī dide min ū dibēje:

-Kincē kulfeta we ne,bibin!

Ez li çavē wē dinērim,lē ew serē xwe dihejīne,wekī hay ji tiştekī nīne.

Ez,kinca ker tīnim,datīnime otoē.

-Em navē keçkē çi daynin,-hingē dengē te kete guhē min,-min gulizar daniye.

-Navekī rind e,-ez şa būm.-Rastī jī guliyē wē zerin?

Tu serē xwe dihejīnī,wekī erē.

...Gulizar mezin dibū.Me gelekī lē hiz dikir.ewē zarayī qey bējī him mala me,him dilē me tijī eşq ū şabūn kiribū.Me jē re leyistokē cūre-cūre kirrī būn ū wexta pē destkē xweyī piçūk wana re dileyist,me tirē ji şabūna erd ji bin lingē me direve ū emē ji bextewariyē hişē xwe winda dikin.

Lē Gulizer heft mehīyē de nexweş ket,mir.

Ez naxwazim wan rojē giran bīhr bīnim.

Ewana rojē emrē minē lapē çetin in.Ez gelekī ber xwe diketim,lē min nedixwest,wekī tu vē yekē bihesī.Ez ber dilē te de dihatim.Lē...Şūşa dilē

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

te kūr şkestī bū.Te leyistokē Gulizarē dīwēr ve dardakirī būn ū timī te li wan dinihērī ū hēsir ji çavē te gulol dibūn.Min zani bū,wekī tu helisī dibī,lē...

Dibējin dem birīna dikewīne.Diqewime wisa ne?Rojekē soro-moro buyī te gote min,wekī duhalanī.(zaroyan nexweş)Ū min texmīn kir,wekī eva salekē zēdetir e,ko cara pēşin şabūn kete dilē me.Rojekē jī min dīt,wekī te leyistok veşartin.Ez şa dibūm,wekī te bīhr dikir....Lē tu ditirsiyayī.Xofeke mezin ketibū dilē te,wekī çetin xilas bī.Cara pēşin dixtora encax emrē te xilas kiriye.Ez ber dilē te de dihatim,Wekī zikē pēşin de gelek kulfetē cahil dikevine wī halī...

Niha şev nīvī buye.Tu deng ū behsek ji te tune ū dilē min de jī xofeke (tirs) mezin e.

Westiya me.Ēdī nikarim herim-bēm ū ser kursī encax rūniştime.Min xwest cixarekē bikşīnim,lē bīhr anī,wekī her du top cixarē min jī zū ve xilas būne...Heyatē da ez tenē mame ū yek jī qerewelē kal,ko nava heyatē diçe-tē ū rehet tizbiyē xwe dikşīne.Car-carna nēzikī min dibe,pē dihese,wekī hela tu behs tune.Serē xwe dihejīne ū nava heyatē (turt) diçe-tē...

Nişke ve reqīna dērī hat.Qīzeke cahil,xeleteke spī lē,şa ber bi min hat Min tirē dinya dora min dizivire...

Qīzikē destē min guvaşt ū tiştek got,lē çi got,haē bīhra min! min tirē ēdī ez dengan nabēhim...

-Çavē we ronik,we re kurek buye.-Qīzikē şa got.Pencē roē ē pēşin dabūne serē çiyaēd dora merkeza nehiyē ye bilind,otomaşīna min rē raçand,lē rē ber min būbū bē serī bē binī,būbū bextewarī...

sala 1975-a.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Bervē vekir.Kalē rabū bēra darinī ya kevn ji ber arīka gomē kişand,hewş rēş kir,paşē hilkişiya ser avayī berfa ser lodē,ban temīz kir.Kurē giya bir,kire afira her çar peza,ji qelaxē du kerme hijik hildan ū çū mal.Hewa hişkī bū ū kalē diricifand.Sobe hēdī dişuxulī.Hurmeta wī ber sobē rūniştī bū,kartol kiribūne pēşa xwe,spī dikir,davēte qaska piçūk,dibū çilpiniya avē ū kartol binē qaskē diketin,dibū reqīn...

-Çavē min rē dikşīne,-hurmeta wī şuxulē xwe xilas kir,qalçkē kartola,ko pēşa wē de berhev būbūn,bir vala kire derdana bermalē,pēşa xwe dawşand ū hat kēleka kalē rūnişt.-Divek şemal bē? -ewē çavē kalē nihērī.

Kalē ker (bēdeng ) kerme diskēnandin,dikre sobē.Paşē daxik çaviya sobē re kir,agir lihev xist.Çū pē qaba qonservē,ko xar kiri bū,kiri bū derdana neftē,ji debo neft anī ū ser kerma da (keşkūr ) kir.Bū gulpiniya ēgir,sobe nerm hejiya,alava (pēt,xurrī ) germ mal hilda.

-Dibējī Şemalē bē,erē,-ewī li hurmeta xwe nihērī ū eks keniya.-Çavē te ronik,Şemalē bē,lē?..

Kalē devgīlkē sobē a çūk hilda,agir hemdī xwe kerme girtī bū,dişuxulī. Ewī daxik kire çaviya sobē,wekī sor be.Devgīlk (qapax ) danī,ji cēba xwe qutiya xwe derxist,cixarek pēça.Daxka sorkirī der xist,cixara xwe vēxist, qulapeke kūr lēda ū got: -Şemal roja xweş zehf hatiye,īcar ma vē babaxerē derē te veke.

-De tu wē peya bē,-hurmetē qask danī ber xwe ū kartol hūr kirin.-Dibēn pēşda kişandine,Otoē hukumatē danē.

Nişke ve derī hēdī kutan.Kalē ū hurmeta wī ve her nihērīn ū herda jī ber bi dērī lezandin.

-Lē min digot,-hurmeta wī şa bū.

Kalē derī vekir.Sadoē namebir bū.

-Roja we xēr,-Sado got ū kaxezek drējī kalē kir.-Tēlēxram e,apē Elī,-ū defter raberī kalē kir,- kerema xwe vira qol ke.(imza ke )

Kalē cihē ko Sado nīşandaē,qol kir.Berçavkē xwe danīn,xwand:Bavo,Ismayil Sorik derxistine,herke gund de şīrē kerē heye,hebe şīr bīne.Şemal„ .

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Destê Kalê lerizî.Hurmeta wî,ko ker kêlekê sekinî bû,jê pirsî,çi qewimiye.Kalê jê re got.

-Kera mala Smoê Cewo çendekî pêşda fîrq buye.

-Sado got,-wê rojê min jî bona zarê me anî.

Kalê qoşek hilda û Sado re çû.Hinekî şûnda ewî şîr anî.

-Qîza Efo,cê ka kincê min derxe.

-Ro çû,ka tuê çawa herî? - Bû tûfe-tûfa hurmeta wî.

-Cehenema min kirî,-Çav buriyê kalê tevhev bûn,-xwe caniya min caniya Îsmayil ne çêtir e.

Hurmetê ji qutiyê kincê mêr anîn,ber danîn.

-Diqewime ez îşev nikaribim vegerim,-ewî hurmeta xwe re got,-gazî xaylaza xûşka xwe ke,bila bê cem te razê.

-Sehet çi ye? - hurmetê jê pirsî.

Kalê dest bire beriya xwe,zincîra zîvina zirav kişand,bistiyê sazkirinê hêdî guvaşt, qalpaxê sehetê vebû.

- Duda xevtiye bîst deqe,- kalê sehet kire beriya xwa.- qe pere cem te hene? Hurmetê dest bire berpişta xwe,kîskê xwe derxist,vekir û kaxezekî sê Manatiyê (pereyê Ermenistanê ) qerçimî (qurmiçkî) raberî kalê kir:

- Xêrê nebînim,evî perê cem min.Min te re got jî,neçe wan qaf-qopa mekire!

Kalê ker sê Manat hilda,qoşê nava qezatekê de pêça,kire beriya kûrkê xwe û der ket.

Berfê dîsa destpêkiri bû dibarî,pêre jî baêkî sar dihat.Kalê xwe li merkeza nehiyê girt,çû.

Çiqas diçû,berf diha qalim (stûr) dibû.Lê rê hê gelek ma bû.Sapokê wî şil bûbûn,av dikşandin û lingê kalê serma dikirin.Lê ewî te digot,sar-serma bîhr kiriye..

Ewî gelekî Îsmayil hez dikir.De kîjan kalik neviyê xwe hez nake?Lê kalê tirê hez kirina wî başqe ye.Havîna,wexta Îsmayil dianî cem xwe kurkê picûk jê hêvî dikir,wekî ew dixwaze timî cem kalkê be,wekî bajêr de hinda mala wana,ewqas hêşinayî,kulîlk,şîr û qatix tune.Wekî ne dê û ne bav mî-

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

bavê bû.Tiştekî bixwe,gund de çi jî bidêyî,na-na nake.

Berfê ser çavê kalê dixist,kincê wî şil dibûn,giran dibûn.Lê kalê dilezand,wekî pê kî (gav kî ) pêşda bighîje Îsmayil.

Merkeza nehiyê de ew pê hesiya,wekî otobusa kutasiyê nîv seheteke pêşda leqiya ye. (çûye)

Rojê Şemî bû û wî zanibû,wekî otobusê mayîn çetin hebin.Destê kalê erd-ezman qetya bûn û ew ker li ser riya ber bi bajêr diçû-dîhat.

Nişke ve otomaşîneke "Volga„ ber wî sekinî.

- Tuê herî bajêr xalo? - otoajo şûşa pencera kêleka xwe daxist û ji kalê pirsî.

-Belê,- kalê got û poşman bû,wekî rast got.Axir cêba wî da tenê sê Manat hebûn.Ewî destê xwe ker bire cêba xwe.Sê Manatî cihê xwe de bûn.

Tuê çi bistînî? - kalê li çavê otoajo nihêrî.

- Çi bistînim,- otoajo xeyid got,- çima tu nizanî vê berf-baranê otomaşînê ku hatine.Ez zehf zorê nadme te,pênc Manatekî...

Rengê kalê teyirî.Destê wî cêbê de lerizî û tiliyê wî xu dan.

- Aqas li cem min tune,- kalê got û bona otoajo texmîn neke ew çi halî da ne,dest bire beriya xwe,sehet der xist û nihêrî.Sehet heft bû.

Sehet otoajo xweş hat.Ewî ji kalê hêvî kir,sehet hilda,lê nihêrî.Sehetê beriya van axiriya dîsa bûne edet.Lê seeta wa bedew ewî cem tu kesî nedîtî bû.

- De wekî perê te tune ne,- otoajo got,- seeta xwe bifroşe min.

Berçavê kalê bû dûman,germeke ne eyan da qafê (serê ) wî û ewî tirê li ser keramê bûzê (cemedê) sekiniye û ha-ha bûz ê bişkê û ewê têkeve berê. Lê dema dinê şabûneke ne eyan kete dilê wî.Wekî seetê bifroşe,perê rîya wî yê hebin û wê gavekî pêş de bighîje Îsmayil.

- Difroşim,-kalê got û hizir kir,wekî dilê wî firî gewriya wî û hewa têra wî nake.

- Çend Manata bidme te,xalo? - otoajo pirsî.

- Hema te çi da,- xeber encax ji devê kalê der ketin.texmîn kir,wekî.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

- Bimbarek be,-kalê xwest wa bêje,-lê beşer tenê demekê ser lêvê wî bîter bû û temirî...

Otoajo bîst û pênc Manat da kalê û teklîf kir,wekî rûne.Kalê qincilî ser hev mîna merivê sûc ser de be.Otomaşînê ber bi bajêr lezand...

...Ew sehet bavê jê re bi ga kî kirî bû.Ewî hingê xort bû û wextê wî zewacê.Gundê wan da tek-tûka merivê xweyî sehet hebûn.Bavê gelekî kurê xwe hezdikir,Lawê wî tenê bû.Ewî sehet bir,ser da nvîsandin,wekî bîhranîna bavê wî timî cem bimîne.Deqekê sehet ji beriya xwe dernedixist.

- Eva jî bajar,- otoajo got.-Riya min heta vira ye.Taksî gelek in,têy wexta ra bighîjî cîh...

Tarî keti bû erdê.Kalê demekê cih de sekinî.Nizanbû westiyayî bû,yanê derdê sehetê ew demnandî bû.Ronahiya işqê bajêr cûre-cûre berçavê wî direqisîn.

- Tu hîna virayî xalo,- dengek wî tesele bû.

Kalê li ser milê xwe vegeriya.otoajo bû,ji ber avayê pêşber hat li ber wî re çû.

Kalê ser hişê xwe de hat,dît,wekî ew ber avayê (xaniyê ) Şemalê...

* * *

Berbanga kûr kalê rabû,çû eniya neviyê xwe ramûsa,dey li kur kir,wekî wê vegere.Şemalê texmîn kiri bû,wekî bavê wî şev rehet raneza,wekî tiştekî tewatî nedidaê.Ewî kulfeta xwe re got.Jinê gotê,wekî kale,bêy hurmeta wî xewa wî naê.

Şemal xewarî kincê xwe li xwe kirin,bav mecbûr kir,wekî tiştê bixwe,lê kalê nesekinî.

Ber dêrî şemal hêdî,wekî kulfeta wî nebîne,gote bavê xwe.

- Perê riya te hene? - tu xweş bî lao,- kalê dêmê xwe sape kir,wekî hesîna dilê wî texmîn neke,- şukir...

Kalê lezand,ew ji mala kur,ji bîhranînê xwe direviya...

* * *

Baltûz û bacanaxê Şemal ser Îsmayil de hatibûn.Hinekî şûnda Sêvdînê otoajo hate hundur,wekî wana bibe malê wan.

- Sehet çi ye? - bacanaxê mezin pirsî.

Sêvdîn dest bire beriya xwe,zincîra zirav kişand,bistiyê sazkira wê hêdîka guvaşt û qalpaxê wê vebû.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

- Donzdeh ye.

Gişka heweskarī sehetê nihêrī.

- Kerema xwe bide binhêrim,- bacanaxê mezin got.

Sehet ji destê yekī derbazī destê ê mayīn dibū.Şirqīnek dilê Şemal hat. Ew sehet nas e.Ku dītiye? Axiriyê sehet kete destê wī.Ewī sehetê nihêrī ū ser qalpaxê wê xwand."Bīhranīna Eliyê kurê min re.Semend„ .

Rengê Şemal çū.Ewī tirê sehet pêtê agire ko kete ser destê wī.Belê,seheta bavê wī bū.

- Te ev ji ku aniye Sêvdīn? - Baltūza Şemal pirsī.- Seheteke rind e,orījīnal e.

Beşerek li ser dêmê (rū yê ) Sêvdīnī qure peyda bū.

- Seheta wa cem tu kesī tune.Ew jī bextê min anī.Duhī êvarê ez ji nehiyê dihatim.Kalek dihate bajêr.Perê riya wī tune būn,sehet firote min.

Şemal nişke ve texmīn kir,wekī sehet mīna tizūrikī xwīna destê kefa destê wê dimije.Ū ewī xwe gunehkar nas kir ber bavê xwe,kurê xwe,Īnsafa xwe ū ber vê seheta bê ruh...

* * *

...Kalê berêvarê gihīşte mal.Hurmeta wī li ber sobê rūniştī bū ū hīviya wī bū.Pey pirs-pirsiyara re ewê kalê pirsī,sehet çend e,ne wexte şīva pêz e.Kalê destê xwe bire beriya xwe ū ha-hanga xwe paşda kişand,te got qey marekī serê bêçiya wī da.

Hurmetê li kalê nihêrī.Rengê wī teyirī bū.Devê beriya wī vekirī bū ū zincīra zīvine zirav nedihate xuya kirinê...

Ewê ker (bêdeng) cī (cil,nvīn ) vekir ū kalê kete nav.

sala 1976-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Cara pêşin bû,wekî ewana xewle rastî hev dihatin.Ew çend roj bû,ko hev re bûbûne nas.Xwendekar bûn.Xort bajêr de nas bû û qîzik her soqaq û meydan,bexçe û avayî,bi gilîkî qul-qarçêd bajêr re dikire nas.Westiyan.Qîzikê got,wekî bona wê rojê ewqas êdî bes e û lazime hebekî vêsa bin.Xort ew bire nava xasbexçe.

Wexta çûne hundur,kulfeteke por spî nava bêx de digeriya,gava çav cahila ket,beşerek li ser dêmê wê peyda bû û bi çava aliyê bexçeyî çepê nîşanî wan da.

- Vira re dibêjin "qurçê bengiya„ - xort li qîzikê nihêrî.

Qîzik li ber dareke spîndarêye bilind sekinî,bi tiliya qalçkê wê re lîst û gote xort:

- Bila eva bibe dara me.

Xort kenî û li ser rûniştoka kêleka spîndarê rûnişt.

- Eva jî rûniştoka me!

Payîz bû.Belgê dara yên zer buyî diweşiyan,mîna minminîkê qîçik nava hewê de perwaz didan û nerm dadanîne ser erdê.Qîzikê destê xwe drêj kir,du belg nava hewê de girtin û kire nava qatê kitêba xwe.

- Tu payîzê hez dikî? - ewê xort pirsî.

Xort destê wê girtin û li çavê wê nihêrîn:

- Ez te hez dikim!

Nişke ve bû gure-gura ewrên payîzê.Baranê reşand,her du jî kincêd payîzê yên tenik ve bûn.

- Bila dara me,me star ke,- xort destê qîzikê girt û çûne bin dara spîndarê.Baranê gur kir.Pîskê baranê nava çiqê dara spîndarê re direşiyane wan.Û her du jî rind şil dibûn.Hewa carekê de sar bû.Bû çeqe-çeqa dev-dranê qîzikê.Halê xort jî ne tu hal bû.

Kulfeta por spî,ko nava rêz digeriya,bîhnçikiyayî xwe wan re gihand.Hahanga xelata xwe êxist avête ser serê xwe û her du kirine bin milê xwe, mîna çivîka ser hêlînê.

- Xwendekar in- kulfeta por spî pirsî,

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

- Xwendekar in,- qīzikē caba wē da.

Kulfetē hezningeka kūr rahīşt.

- Kurē min xwendekar bū,īnstītuya dixtoriyē de,lē...Ewē serē cahila sīngē xwe ve guvaşt.

Qey bējī hewaē tēra wē nekir,ji çavē wē du hêsir gulol būn,yek ket ser sūretē qīzikē,yek jī ser sūretē xort.

- 41-ē çū şer.Nehat...

Ewr çawa ko nişke ve top būbūn,wisa jī bela būn.Tava şīrīn da nava bexçē.

- Pēy baranē re bīhna bexçē me xweş e, - kulfetē got ū bi pīneyī destē xwe rūniştok ziwa kir.

Xort cixare vēxist.Qīzik ketibū nava mitaala.Ewē çavê xwe ji kulfeta por spī nedibirī,ko pēşberī wan belgēd dara yên weşiyayī gēzī dikir,dikire nava ava çēm ū çēm dibir.Xort qoncē cixara xwe avit.Kulfeta por spī hemdē xwe nēzīk bū,daçiviya,qoncē cixarē hilda ū avēte derdana qlērē.

Qīzikē li xort nihērī.

- Şerm e,Exmed,du gavin hetanī derdanê.

- E,ew dēnē wē ye,- xort got ū cixarekī teze vēxist.- Bona wē yekē ew peran distīne.

Te tirē brūskē nav çavē qīzikē xist.Ewē wisa texmīn kir,wekī kulfeta por spī şuxulē xwe kuta kiriye,Bin darē de rūniştiye ū qeyī bējī hēviya tiştekī ye.

Exmed qoncē cixarē dīsa avit.Qīzikē hew dīt kulfeta por spī ji cīh rabū ū hēdī ber bi qoncē cixarē çū.

Qīzik ji cih quloz bū,qoncē cixarē hilda,avēte derdana qlērē (qutiyē çopē ), lez ber bi derē bexçē çū.

- Sīnem,- xort gazī kir,- ku da?

Lē qīzik lē venegeriya.

Bū gure-gura ewra ū barana payīzē dīsa reşand...

sala 1975-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Evê baharê Emo bû şivanê oba me.Diçû ber pezê stewr.Xortekî ecêb bû Emo. Bejn¯de nîvçe,şal-blûzê xelîfe lê,piştê qayişeke fireh.Alîkî qayişê ve destmala xweye gul-gulî girê dida,lê aliyê dinê de blûra xwe darda dikir. Emo neyî bedew bû,lê xwînşîrîn bû.Me,berxvana gelekî qedrê Emo zanibû.Bona me ew "merivekî dinê-dîtî û ceribandî bû„ - çawa timî Emo digot.Bi gotina wî,ew qasî pirça serê me,ciya geriya ye,dinya dîtî ye.Lê em hîna zaro ne,"Tam a şîr devê me tê„ Û me ji çiyaê Axmaranê wêdetir tu tişt nedîtî ye.Wan gotina emo ber çavê me bilind dikir,dikire qasî çiyaê Reş û em xewnêde jî difikirîn,wekî mezin bin,emrda pir hindikî bighêjne Emo.Lema jî em berxvan ji Emo dûr nediketin.Sibê zû,wexta me berx ji kozê derdixistin,berê pêşin me çavê xwe digerand çika Emo pez kîjan alî dibe û me jî berxê xwe wê de diajotin.

Emo blûreke hêja lêdixist.Qîzê obê wexta dihatine çolê pesariya,lezobezo çewalê xwe dadigirtin û direviyane cem Emo.

- Emo can,Emo,- tewaqe jê dikir,- ca qeydê "Mem û Zînê„ lêxe.
- Emo can,Emo,qeydê "Siyabend û Xecê„ ...
- Emo can,Emo...

Û qîzêd çiyaêd me,ko kubar bûn mîna pezkûviya li ser baxir bisekinin û jor de li gêlî binêrin,ber Emo mahrem dibûn,hêvî dikirin.

Emo ber çavê me diha bilind dibû,ji çiyaê reş jî bilindtir...

- Pezê min çû,- Emo qure dibû û meenî digirtin.
- Cikî de naçe,- qîzka hîvî dikir,- emê sirê pêz vegerînin,tenê tu lêxe.

Emo blûr dida ser lêva û miqama li ser çiya perwaz dida.Te qey digot cew û kaniyê Axmaranê hev re dikine xule-xul û ser gola Qanîgolê de tên.

Çavê qîzika tijî hêsir dibûn û Emo şa dibû,wekî dengê blûra wî dilê wan dihingêve,kaf-kûn dike...

Qîzika çewalê xwe hildidan û melûl-melûl ber bi obê diçûn.

Emo smêlê xweye reş badidan,dikire gustîl mîna struyê (qoç) berana û şahî digote me:

- Lawikno,qîzê oba me temam ser min bengî bûne,lê ez tenê yek im,Emok. Ez jî tenê Sînema Elî hez dikim.Û Emo destmala xwe ya gul-gulî digirte

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

xwe,pehniyê sapokê xurom qalin lihev dixist,dilîst û distra:

Sînê,sînê,Sînemê,
Pişt kutaye kemberê..

Emo hêdî çokê xwe dişkênandin.

Û Emo li ber çavê me diha bilind dibû,ji çiyaê Reş gelekî-gelkî bilindtir...

* * *

Ewê rojê nîvro min berxê me anîne mal,xwêdewê.Min dît mêrê obê gişk li li ser xwêdaniya me top bûne,meede kirine.

- Lingê xweyîyê şkestî îcar ku de hate vira,- dengê rîspiyê obê Semendê Îsmayil min tesele bû,- em hatine vî çiyayî pezê me kibabe-goşt bigre,payîzê bifroşin,hezar derd-kulê me hene.Lê evî beytû blûreke nebioxiriyê girtiye xwe,çav qîza dikeve sibê hetanî êvarê fîke-fîka wî ye.Talaşa wî ye. pez halê qirê da ye.

Min fehm kir,wekî gilî derheqa Emo da ne.

- Camêr,min serê-serî de we re got,- Exmedê Teyar ser kevirê xwêdaniyê rûnişt,- Axir Etemê bavê wî çi dû xwe re kire qeretû,wekî ev me re çi bike. Ew jî beytûkî mîna vî bû,Defkek diavite stuyê xwe,nedixebitî-neditebitî, sibê hetanî êvarê tinge-tinge wî bû. Rojekê qeh we dît,wekî destê xwe daniya ser zikê têr!

- Êdî çi biye,biye,- Semendê Îsmayil got,- niha gotî em xwe re rêkê bibînin,yan na,wê dewê me têke kevçî.

- Evan kok qeliyaê qîza jî diçin dorê top dibin,hişê serê wî birine,- Semend xeberdana xwe pêşda bir.- Qe bav tembiyê nadine wan.

Mêrê obê gişka serê xwe kirine ber xwe,Keremê laqirçî kenî û gote mêra:

- Lawikno,ezê niha tiştekî we re bêjim,gora min bikin,lê tenê xêncî me bila kes nizan be.- Û mêr ber bi topkê pêşberî obê çûn.

...Êvarê her kes ber qîza xwe sekinî û hêrs got:

- Raste,dibên,dilê Emo ketiye te?

Qîzik digriyan,xwe erdê vedidan,wekî tiştê wisa tune,kê gotiye?

- Emo cem şivanê obê mayîn payê xwe da ye,- mêra hêrsa xwe radikir û dilê xwe de şa dibûn,wekî rastî jî gotina keremê laqirçî hukum dike.

Wê êvarê temamiya qîzê obê gîriyan...

* * *

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

* * *

Sibetirê Emo berī pala pala çiyaê Reş dabû.Hate cem me û got:

- Lawkno,çawane,īro "gogerçīnê„ min naêne xanê.

"Gogerçīn„ Emo keçika re digot.Me milê xwe helkişand.Mêra qirka me jī girtī bû,wekī em ji Emo dûr nakevin,pê re dikevine xeberdanê,lewma Emo pez naçêrīne.Lê me derheqa vê yekê de tu tişt Emo re negot.

Nişke ve me dīt qīzê obê çīt girtin,hatin.Emo şa bû.Blûr danī ser lêva û dengê miqamê "bêjingbirê„ li çiya bela bû.

Emo,- wexta qīzik nêzīk bûn,xanimzera Evdī got,- Emê herne serê çiyê, Sīrmī.Pez wê diçêre,bila dīna berxvana lê be,tu me re were.

- De lawkno,ez heyrana we me,- Emo gote me.- hema pez berjêr ber bi terazina hat,pel kin,bila jê re bê,ezī jorê me.

Qīzik û Emo ve çûn Xêlekê şûnda qare-qar serê çiyê hat.

- Hewar,hey hewar,ez bextê we me,werin,min xilas kin,- Dengê Emo me tesele bû.

Em revīn,nizanim me çi cûreyī çiyaê bilind firqaz kir.Wexta em gihīştine serê çiyê,me ecêbeke qewmī ber çavê xwe dīt.Qīzika Emo navikê hevraz(berjor) tazī kiribûn,herekê gurze gezgezik girtibû xwe û pişta wī dixistin.

- Mirdarê geniyo,em dihatine cem te,te tirê em hewcê te bûn,- qīzka dikire qare-qar.- Em hewcê blûra te bûn.Te jī çû yī cem xelkê payeyê xwe daye, wekī qīzê obê gişk ser min bengī bûne.De bigre xwa īja,çi ka bengītī çawaye!

Me encax Emo ji destê keçika derxist.Pişta wī sor bûbû mīna bostanê ser ceperê û pel-pelī bûbû.Emo ji êşa giran dienitiya...

Emo êdī blûrê nedixist.Şerma xwe nedihate cem me jī,wekī qīzika wisa anī serê wī.Êdī ji pez nediqetiya.Ro-ro pez kok dibû.Lê mêrê obê gelek wext kirina Keremê laqirçī bīhr dianīn û dikeniyan...

sala 1969-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Evdiyê cînarê me gelekî kumreş bû.Gulîzera jina wîê feqîr dest de keti bû zêrzebelê.Tirsa Evdî newêrî bû serê xwe ji mal derxista,biçuya cem canikekê xeber bida.Evdî sibê hetanî êvarê ji mal dernediket û mîna kundê kor xwe de dikire pore-por.

Rojekê Evdî ne li mal de bû,çûbû mala xwîska xwe.Gulîzerê dew kiya,kuta kir,rabû parzûn û tojen hildan,çû ser golê bişo.

Nîvro bû.Pezê stewr hatibû ser golê avê.Mêrê obê jî ser golê top bûbûn her kesî nav pêz de pezê xweyî kok dibijartin,wekî bibine bajêr,bifroşin.

Evdî nişke ve sîwarî jor de hat.Dîna xwe daê Gulîzera jina wî wê devzendkê kurtikê xwe ser de qat kirine,tojena dişo.Ber çavê Evdî bû şevereş gol dora wî hat û çû.Banzda erdê,hêrs dizgîna hespê da destê Gulîzerê û kêr ji cêba xwe derxist,tojen qet-qetî kir û avite golê.

- Şerm e,Evdê Xwedê,xwe rezîl nekî,- Gulîzerê sûcbar gotê.

- Ez te re dibêm ber çavê min ewterebe,- Evdî ser Gulîzerê de qûjiya.- Ezê te re paşê xeberdim.

Gulîzerê li tojenê qet-qetî kirî nihêrî,ko mîna qayîkêd şkestî li ser ava golê pêl didan û kêr dewlê xwe hildan,çû mal.

Pîrqîn kete mêrê zomê.

- Kuro,ev xenîmê tojena ye,- Keremê laqirçî got û hêdî kire gazî:"Tojen„

Evdî navê xwe hesiya bû.Lê çi bikira?Ne xwezîla min wî merivî,wekî li çiyaê me navê zêde bidana ser.Ew nav ser wî dima hetanî roja mirinê.Pey re jî ew nav nedihate bîhr kirinê.Digotin kurê filan kesî,neviyê filan kesê.Qerez,hetanî ew bîhra cimaetê de bima...

Evdî ber xwe diket,xwe de dişewitî.Şerma xwe nedihate nava mêra.

Evdî zanibû,wekî Keremê laqirçî ew nav daniye ser,Pozê xwe girtibû,pêre xeber nedida.

Rojekê,sibê zû gazî Kerem dike,jê re botilge ( şûşe )yek qonyak vedike û dibêje:

- Ez bextê te me,ez zanim te ew nav daniye ser min.Em meriyê hev in.Pîrka te qîzxaltiya pîrka min biye.Qedrê te jî nava mêra de gelek e,wekî tu wî navî nebêjî,kes nabêje.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Û Kerem Evdî şîret dike,wekî lazim e gazî mêra ke:Wana bidine sondê,wekî kes êdî wî navî hilnede.

Lê çiyaê me sozê mêra serê mêra yek bû.Gava sond xwarin,hizkî guleyekî jî bikutine qefesa wan,sozê xwe poşman nabin.

Evdî pezek şerjê kir,şand qeleqelê îçke ( vexwarin ) anî.mêra xwar-vexwar û destê Evdî de sond xwarin,wekî êdî tu wexta navê wîyî zêde hilnedin.

Rastiyê wisa jî bû.Bere-bere ew nava dihate bîhrkirinê.Lê rojekê...Belkî oxirê xisti be,kurê Evdî kera mala Selîm suwar dibe.Kurê Selîm jî diçe,kerê xwe jê bistîne.Hingê kûçikê mala Evdî dadide gede û goştê nermê hêtê zol dike.

Nişke ve qûjîn ji mala Selîm hat.

Cînar top bûn.Sîsa jina Selîm derkete pêşiya kon û kire qare-qar:

- Lo-lo "Tojen„ .Niha lawkê jor de bên tûê xwe re bibînî.Daê we dît.-Sîsê gote cînara,kûçkê "Tojen„ gedê min xwari ye.

Lawik hatin.Hilbet,dengê xwe nekirin.Kê seba kelba xeber dide?... Lê...

Sibetirê Evdî mala xwe ji zoma me bar kir û dewsê... Werga "Tojen„ ma...

sala 1969-a.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Gaê me ī Lado nexwaş bū.Kalkê min ga ji tewlê derxisti bū der ve,ber tavê,lê bi xwe jī ser kevirekī rūniştī bū ū dū qelūnê.Gaê çūr newq avêtī būn,çavê wī a reş ī fireh kor de çū būn,guhê wī,ko tenik būn mīna belgê soê,berjêr daleqiya būn.Kalkê min cixare dikşand ū zūr būbū li gê dinih-erī.Mize-miza gaê Lado bū,ji çavê wī glêja spī mīna hingiv diniqitī...

...Ew du roj būn,ko Lado dev neda bū tu tiştī,qet zilê giya jī neqetand bū.Mexel hati bū,serê xwe dabū ser cendekê xwe ū ente-enta wī bū.

Kalkê min ji cihê xwe rabū,destê xwe nerm da bin çena gê ū serê wī bilind kir.

- Serê xwe xwe ranagirī,- kalkê min melûl got.- evī ça dest-pê li me birī,mala me xirab kir,dūrī nefera...

Lado qey bêjī gotina kalkê min fehm kir,kire mizīn ū ji çavê wīye reş du hêsir gulol būn,ketine ser sūretê wī.

Kalkê min destê xwe çoka xwe xist,serê xwe hejand ū çū ker cihê xwe de rūnişt.

- Qîza Hesen,- ewī deng li pīrka min kir,- ça here hinke ceh bīne,çi ka Lado naxwe.

Pīrka min,ko destê xwe tewer kirī būn ū ber dîwêr sekinī bū,ker ber bi malê çū.

Hinekī şūnda ewê berosa cehê kelandī danī ber gê.

- Lado can,bixwe,- kalkê min serê gê mist da,-binêre kevaniyê seba te cehê kelandī aniye!Axir te gelekī cehê kelandī hez dikir!

Lado nerm çavê xwe vekirin,li berosê nihêrī ū kire mizīn.Ewī ewê beroşê de ceh dixwar,Cehê kelandī.Her êvar,rojê çi bixwara,çi nexwara,cehê wīyī kelandī hebū.Malxwê malê hukumī ser kevaniyê dikir,wekī nīvê şevê biya jī,gotī bikelanda,bida Lado.Ū ewī bi mudetekī xwaş ceh dixwar,cehê kelandī,ko livliv dibū,mīna karbara dibiriqī.Lado li beroşê nihêrī,kire mizīn ū devê xwe kire beroşê.

- Bixwe,Lado can,tu bixwe.Hê nīv xalvarī zêdetir cehê te heye,besī te ye Zūtirekê êdī hilgire,Lado can.Emê herne zozana,nava gul-qulīlka,avê kaniyanê sar.Tuê ji xwe re aza nava mêrga bigerī,dīsa bêy ser qamê xwe.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Lê Lado dīsa devê xwe ji beroşê derxist.Lēvê xwe hêdī alast ū dīsa serê xwe danī ser cendekê xwe.

- Xwedēo,tu Lado rehm bikī,- pîrka min got,- axir sivik hilgêre,emê bêy Lado çawa bikin,koça meē bimīne.

Kalkê min,ko destê xwe kiribūne ber qayişa zīvīn ū nava hewşê diçū-dihat, gote pīrka min:

- Qīza Hesen,em neşīnine pêy Elī,merivekī sehreza ye,bila bê,belkê çarekê bike.Lado konekī heftstūnī hêjatir e.

- Bişīne pêy,- pīrka min got.- êdī ma hêviya Xwedê....

Kalkê min ez şandime pêy Elī.Wexta Elī hate hewşê,gote kalkê min:

- Mala minê,Welleh,heyfa Lado,brakî bê par bū.Hela were em devê wī vekin,

- ewī gote kalkê min,- diqewime zmanê wī hatiye.

Elī ū kalkê min devê Lado vekirin.

- Xwedê bike bila hema zman be,tiştekī din tune be,zman hêç,wê pak be,- kalkê min got.

Sêtiya zmanê wī kirin,silamet bū.Elī dora gê çū-hat,çavê wī vekirin,dīsa li devê wī nihêrī ū gote kalkê min:

- Çetine,Lado xişxişeyī biye!

Kalkê min cihê xwe de rūnişt.Qutiya xwe derxist ū raberī Elî kir.Elī jī kêleka kalkê min rūnişt ū dū dane cixarê.

- Lado,gaê kona bū,- kalkê min,qey te digo ber xewa xeber dida.- konê me ī du rêze bū,pênc stūnī.Min kon li Lado bar dikir ū sītila meye mezin jī dida ser.Qet xema Lado bū? Hevraza da wisa diçū,te digo,tobeye,tiştek li ser piştê tune,rêkoçada ezī Lado ve piştber būm.Lê payīza,wexta me giya dianī,heta xelkê pīk danī,min pê Lado êdī du pī dikirin.Tê bīhra te,Elī, wexta min Lado kirrī.Hê canega bū.Hūr bū.Te go bikire.Nīşanê wī heye,gakī rind ê jê derkeve.

Elī ker guhdariya kalkê min dikir.Wana derheqa rojê çuyī,emrê zozanvana ū cahiltiya Lado da xeber didan.

- Tê bīhra te,- Elī gote kalkê min,- wexta em çūne gemrêzê.Em gelek merī būn,sīh ga mera būn.Barê Lado ji ê giska girantir bū.Ga temam westiyan,lê qe xema Lado jī nīn bū.Şebeb go,sê gaê min hene bila qurbana simekê Lado

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

bin.Bila deh gaê meriya tune bin,her yek be,ew jî mîna Lado be.Hingê min te re got,wekî Şebab merivekî çavînok e.Wexta dighîjî mal,morîke şîn stoyê Lado ve girê de.Te gora min nekir,lewma jî çendekî şûnda lingê Lado kete çingil û şkest.

- Ê,Elî,- kalkê min hezineke kûr kişand,- qeziya wexta hat,li moriyê nanihêre.Lê Xwedê sihetê bide te,te wisa lingê wî cebirand,Lado hefteke de hate ser xwe.

Kalkê min rastî xeber dida,lê bin çava da hêy gaê Lado dinihêrî,te digo bi çava wî re xeber dide.

Pîrka min hat ber kalkê min sekinî,destê xwe da ber ruyê xwe û got:

- Te vê sibê de tiştek nexwariye.Min sawar çêkiriye,tu û birê Elî ve werne mal.

Kalkê min û Elî ve çûne hundur.Pîrka min sawar anî ber wana.Her yekê hê loqek (parîk ) nexwarî bû,wexta pîrka min lez hate hundur.

- Zû werin,ga mirar dibe!

Kalkê min û Elî ve tev der ketin.

- Zû ke malxirab nîno,çi çavê min dinhêrî,mirar bû,heyf e,- Elî gote kalkê min.

Lado stuyê xwe drêj kirî bû,çavê reş tevketi bûn û amangî lingê xwe dibir-dianî.

- Zû ke,Elî dîsa got.

Kalkê min cîh de hişk bûbû.

- Mirar bû,gidî,- Elî hêrsa xwe rakir.

- Destê min nagire,Elî,ez Lado şerjê kim,- kalkê min got û kêr raberî Elî kir.

Çavê kalkê xwe de min cara ewlîn hêsir dîtin.Du hêsirê mezin ji çavê wî gulol bûn,ketine ser sturiyê (qoç) Lado.

Hinekî şûnda goştê Lado êdî hûr kirî bû.Kalkê min para cînara şand.Çi ko ma,kirine sîtila meye mezin,danîne ser tendûrê.

Kalkê min ber dêrî ser kevirekî rûnişti bû,keti bû nava mitalê kûr û,pê serê şivka xwe erd dikola.Lê nava bîhranînê wî de gaê me yî Lado diçû,Barê konê me yî pênc stûnî,lê li ser barê wî sîtila meye mezin bû,kîjanê de niha goştê wî dikeliya...

sala 1969-a.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Berf dibarī.Kuliyê berfê nazik nava hewaê de hev hemêz dikirin ū nerm dadanīne ser erdê.Wisa fesal ū nerm dihatine xarê,qey bêjī pembuê nerm bū,ko datīnin ser birīnê birīndaran.

Wê rojê,raste berf dibarī ū hewa sar bū,lê dilê meriya şabū,emrī adilī têr ū tijī bū.Sala teze nêzik dibū.Berī īdê bajêr de hatin-çuyīn zehf bū, gişka karê xwe dikir...

Ber derê dikaneke bajêr merī bi sirê sekinī būn,darêd merxê (cam) dikirīn.Ji serê sūqê merivek,binmilkê darīn bin mila da,nêzīkī wan bū.Cimaeta sekinī rê bona wī vekir.Lê ew nêzīk nebū.Demekê bikirçiya ū darêd merxê nihêrī.

- Kerem ke,hilde,- bikirçīkī gotê,- bona we bê sirê ye.

Lê ew ji cihê xwe neleqiya,zūr būbū darêd merxê dinhêrī,ko bikirçiya dibijartin ū eşq-şa dūr diketin.Ber çavê wī re rojêd oxirmê giran mīna şirīta sīnamê derbaz būn....Hingê eskerê me hicūm dikirin...Binetara Moskowaê: Li nava mêşê darê merxê de şerekī giran bū.Hate bīhrê,wekī bin dareke merxê,li ko ew ketibū qeleçê,hate birīndar kirinê.Bi xwīna wī koka dara merxê sor būbū.Nexwaşxanê de pê hesiya,wekī lingekī wī tune...

Ew hingê ji mitala hate birīnê,wextê êdī cimaet bela būbū.Tenê dareke çiqilşkestī ma bū,ko kesī nedibir.Dikançī hilda,wekī wê de bavêje.

- Mavêje,mavêje,wê darê bide min!

- Bêker e,heval,çiqlê wê şkestīne!

Dara ko binda hatibū birīndar kirinê dīsa kete bīhrê.Hate ber çava,wekī çawa ji zerpa bombê çiqlê dara merxê şkestin ū ew jī brīndar bū...Bi xwe jī nizanbū çima,wī tirê xūt hema ew dar e,ko anīne vira difiroşin...

- Ziyan tune,bide min,- ewī got ū nêzīk bū.Dikançī bi teherekī li wī nihêrī ū dara çiqlşkestī raber kirê.Ewī dar kire bin milê xwe ū ker dūrket.

... Kesī re eyan nīn bū,ewī bīhranīnêd rojêd buhurī,yanê dara īda sala teze dibire mala xwe...

sala 1971-a.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Xof ū tirseke ne eyan ketibū dilê Emīnê.Temamiya rojê ji kon derneket. Xwe dixurdilī,mīna meriveke tiştê xwe winda ke,Lê bigere ū nebīne...Ū wextê pezê nīvro hate dana,dot,pez rê danī ū bê sebr hīvīya êvarê sekinī. Wê rojê tenê fikrekê,mīna bizineke baharê çav çilo keve,mêjuê wê dikot, Gelo kengê êvarê bê? Lê gava seyra cīnara wê hat,wekī kevçī havên jê bixwaze,dīt,Emīne ser cacima kevn rūniştiye,eyne daniye ber xwe ū bīskê xwe ba dide.Seyrê ecêbmayī ma.Dibêjin,Seyrê fikirī wexta çiya kulfeta cahil neynikê digre xwe,wekī wisane dilê wê de tiştek heye.Seyrê li devkonkê sekinī.Emīnê,gava ew dīt neynik kire bin cacimê,spīçolkī bū,mīna merivê wextê gunekariyê pê girtine,hat ber Seyrê sekinī.

- Pêşda were,- ewê gote Seyrê.
- Xweşe,-Seyrê gotê.- Min īro dew kī ya,bīhr kir,havên hilneda,ca kevçī havên bide min.

Emīne ker şelbkê destê wê hilda,çū havên bīne.

- Emīne,tu ku buyī,īro qet nehatī xanê,- Seyrê gotê.- Em çūne mêrgê jêrin mendikê..Ça mendike,meriv qet ji tama wê têr nabe.
- Hinekī bêkêf būm,- Emīnê şelbkê wê daê,- vê sibê de serê min dêşe,min īro xwe re qet tu şuxul nekiriye.
- Şemo ber pêz e?
- Na,vê sibê çū gund,hinke onca me heye,çū bidrū.(biçinī)

Seyrê çū.Emīne derkete li ber derê kon ū li çiyaêd bilind nihêrī.Dilê wê zū-zū kuta.Ro li serê haçêd Elegezê ye çarniçkī pêşber da welegeriya ū tariyê bere-bere şar a xwe ya reş serê çiyaêd Axmaranêya bilind daland.

Emīne vegeriya mal,eyne ji bin cacimê derxist,danī ber xwe ū porê xwe şe kir,biskê xwe badan,gulī vegirtin.Rabū xwe serda pê de xemiland,ji xurca būktiyê gulav derxist ū bêneke xweş kete kon.

Emīne bedew bū.Navkêlke zirav,bejnebilind mīna spīndarê,lê çavêd wê,te qey digot,şevê çiyaêd Armaxanê ne,sūretê sor mīna hinara ū dranêd qerqaş mīna kespikê spī.Lê wexta dikeniya,lêvêd tenik vedibūn,herdu aliyê sūretê wê qul dibūn ū meriva nizan bū ji şewqa herçar dranêd wêye zêr būn,ko soraya sūretêd wê diteyīsī,yanê ji soraya sūreta drana şewq dida.Rast e,Emīne diya zikek zaro bū,lê meriva tirê teze ji ber perda būktiyê derketiye.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Wexta qîz bû,gelek xort li ser Emînê bengî bûbûn,geleka xwezila xwe danî, wekî Emîne bibe bûka mala bavê wan.Lê...Yaziya Emînê cûrekî mayîn lê da...

Pismamekî bavê wê hebû,ko li gundekî dûr dima.Mêrik bêwext mir û kurê wî Şemoê çarde salî sêwî ma.Bavê Emînê kurik anî mala xwe,mezin kir û Emîne daê.Şemo ne kurekî xirab bû.Xortekî xebatkar,dilhelal bû.Gelek hevalêd Emînê xwezila xwe wê dianîn.wekî xortekî wisanî qenc û pêşriyayî rastî wê hatiye.Lê Emîne dilê xwe de dişewitî,ewê zani bû,wekî Şemo ew xort nîne, ko rojêd cahiltiya xwe de hêviyê buye...Lê cimaet dibê yazî-miqedder û Emîne,diqewime,wisa jî yaziya xwe re qayilbuyî bima,Eger...Eger nişke ve adî nehata,nehata û mîna qewateke ne eyan neketa navîna Emînê û yaziya wê û dilsarî nekira navîna wan...Ew xortê teylaqî bilind,ko mîna kaniyêd Armaxanêye baharê distra,dilê Emînê kaf-kûn kir,dinya ber çavê wê bedreng kir...

* * *

Hemû tişt awa destpê bû...

Baharê,wexta berfê bora xwe ye spî li çiyaêd Armaxanê pêça,deşt û zozan bi hêşnayî û kulîlkêd reng-rengî ve xemilîn,zozanvanan ra tevayî wisa jî oba gundê G.çadir-xeybetê xwe li ber çiyaê reş lêdan.Şemo û Îsmayil şivan bûn.Du roja şûnda teyrokeke gurr barî,Îsmayilê kal qefilî û nexwaş ket.Sedrê kolxozê gazî Şemo kir,hesp daê,wekî here ji obêd cînar xwe re hevalekî bîne.berêvarê Şemo xortekî bedewî teylaqî bilind re tevayî hate obê.Şemo got,wekî xort hevalê wîyî zarotî yê ye û dengekî xweşî lê ye.Obê adî hiz kir û hewandin.

Adî mala Şemo da ma.wira nan dixwar,lê şevê guharê de radiza.Nehişt,wekî Şemo jî şevê cem wî bimîne.

\- Çi heye,malavao,ezî hişyar im,xwe tu kulfeta xwe tevî zara sibê tenê malda nahêlî?

Şemo çend sala ji Adî mezintir bû,lê wan sala ferqî danetanî nava hevaltiya wan.Bîhranînêd zarotiyê ew diha nêzîkî hev kirîbûn û wana gelekî qedrê hev dizani bû.Wekî hêkek jî malda hebuya Şemo bêy Adî nedixwar.O rojekê jî wana qirar kir,wekî ne ko tenê hevalêd nêzîk bin,lê çimkî birê Adî ji tune ne,rind dibe bibine brê hev,destbrak...

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Şemo mīstewrek serjē kir.Heval-hogir,cīnar berbihev būn,wekī bibine şahidē bratiya wan.Şemo ū Adī ve tiliyē destē xwe birrīn,xwīna xwe tevehev kirin,paşē her yekē çilkē xwīnē kire nav araqē,milē xwe hev re derbaz kirin ū kasēd xwe vexwarin.

Heval-hogir,cīnar şabūn.Deng-sedē Adiyī şīrīn li çiya bela bū,kel ū hub a dilē cahil dibir ū li ser kulīlkēd razayī de dibarand.

Tenē Emīne şa nedibū.Xemeke kūr ketibū dilē wē.Dixwast bikeniya,şabiya. Lē... nedibū.Çima wisane,xwe ū xwe jī nizan bū.Tenē tiştek texmīn kirī bū, wekī kilama Adī dilē wē hingavtiye,ji kēlekē derxistiye,wekī ew kilam tiştekī biha,gelekī biha tīne bīhra wē,derheqa kījanē de Emīne gelekī fikiriye,cedandiye bigīhījē,destbīne,lē dūr maye,destē wē negihīştē.Ū niha ew nēzīk e,gelekī nēzīk ū eger niha destē xwe drēj ke,wē bigihījē,bigre.Adī?... Emīne ji van fikrēd xwe xof kişand,lerizī mīna kareke xezala ji ciha xwe pişk bike.Ewē tenē tiştek fehm kir,wekī nikare,ēdī nikare kilama Adī bibē Çavē wē şēlo būn ū ew ji kon derket.Der ve sayī bū,ezman bi stērka ve xemilī bū ū ba kī çiyaī sar dihat.Emīnē texmīn kir,wekī xem ū xiyalē dilē wē tevhev būne mīna ava kaniyēd çiyaē Armaxanēye baharē ū nikare pēşiya wē avē bigre,çetine,gelekī çetin e.Dilē wē de ew hesīna sala hişyar buye,ko Emīnē ji heval-hogira,ji Şemo ū hela ji xwe jī veşartiye.Lē niha ew hişyar buye,bişkiviye mīna gulbaranē ū xwe ber bi tavē radigire...

Cīnara xatirē xwe xwast,destbrak bimbarek kirin ū çūn.Adī jī çū.

Şemo hate kon. Emīne hemēz kir ū destē xwe bire nava guliyē wē.Emīnē texmīn kir,wekī ew dest sar e,xerīb...

- Em herin razin,- Şemo got ū ber bi kon çū.

Xewa Emīnē nedihat.Adī berçavē wē nediçū.Ewē texmīn kir,wekī ew xort Adī ye,derheqa kījanī de rojēd cahiltiya xwe de fikiri ye,sifetē wī nava bīhranīnēd xwe de hūna ye.Rojēd cahiltiya xwe de? Na.Ew bīst ū du salī ye. Wī çaxī de teze evīna temīz dixuliqe.Xem ū sūcēd zarotiyē derbaz dibin, evīn dibe mīna agirekī antēx kirī (veşartī ).Emīne fikirī,wekī nikare,tu wexta nikare sora dilē xwe Adī re gilī ke.Ew xortekī helal eū dilsax.Paşē jī wē kirina wē zinēkarī be,him aliyē wē de,him aliyē Adī de.Lē ewē tiştek jī zani bū,wekī nikare wisa nikare berxwe de...

www.netewe.com

* * *

Ewê rojê Şemo çûbû gund.Xof û tirseke ne eyan ketibû dilê Emînê.Temamiya rojê ji kon derneket.dor xwe dixurdilî,mîna meriveke tiştekî xwe yî biha winda ke,bigere,lê nebîne...Bê sebr hêviya êvarê bû.Şîva Adî danî ber çaberê,botilge araq danî kêlekê û çû qîzka xwe razîne.

Tarî kete erdê.Adî hat şîvê bixwe.Dît,wekî Emînê xwe xemilandiye.Nepirsî,çima.Ker botilga araqê vekir,kasek-dudu vexwarin,derket çû.

...Êpêce wext ji şevê derbaz bûbû.Çiya û meriv ketibûne xewa hingorê.Emîne ker ji kon derket.Hetanî guhêrê hebe erd bû.Ewê zanibû Adî ser kîjan çengî radizê.

Adî kulavê şivantiyê li xwe kirî bû û ři ser kêleka rastê çeng dabû.Pencê hîvê dabûne dêmê wî yî ber sora çiya dilivî.Bêxem raza bû û hay ji xayintiya şevê tune bû.

Emîne ser wî re sekinî bû û diricifî mîna xezala çav nêçîrvan keve.Ha li konê xwe dinêrî,ha li Adiyê razayî.Turiş (cesaret) nedikir şiyar ke. Demekê xwast kere-ker vegere,Lê lingê wê gora wê nekirin.Ew li ber bextewariya xweye cahiltiyê sekinî bû,ko timî gelekî dûr buye,lê niha ewqasî nêzîk e...

Emîne ker kêleka Adî rûnist.Destê xwe bire nava porê wî.Adî tivancikek da xwe û welgeriya ser piştê. Pêşê kulavê şivantiyê vebûn.Emînê çok da ser pêşa kulêv û destpêkir mîna dîna,Adî ramûsa...

...Adî tirê xewne,li çiyaê wane û zozana wî ye wî radimûse.Ewî milê xwe vekirin,serê zozanê sîngê xwe ve guvaşt û ji hisreta hêsir çavî wî dihatin.

Hîv ketibû pişt ewra û guhêrê de severes bû...

- Tu çawa hatî,ezîza min,te çawa cihê min zani bû?-û serê xwe kiri bû nava perê wê radimûsa.

Adî texmîn kir,wekî guhêr dora wî dizivire.

- Lê ez niha çawa bikim,ezê çawa te rê daynim.?

- Hişşş,-wê me bihesin,-hişkêv dengê Emînê kete guhê Adî.

Hîv ji pişt ewra derket û Adî dît,wekî Emîne ye ber wî sekini ye.Te tirê brûskê li nav çavê wî da.Adî her tişt fehm kir,lê êdî dereng bû,her tişt ji destê wî derketi bû.Bin şewqa hîvê de Emîne mîna keskesorê ber bi konê xwe diçû...

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Adī posī de rūniştī bū ū wadekê drêj bīna gulavê ber pozê wī bū...

* * *

Kew dikete sibê.Adī ji guhêrê derket-ū ker ber bi mala Şemo çū.Obe hê xewê de bū.Emīne qīza xwe kiri bū hemêza xwe,rehet raza bū.Botilgê araqê hêcihê xwe de bū,ber çaberê.Adī kasê araq dagirt.Kêr ji cêba xwe derxist, tiliya xwe birrī ū gilke xwīn ser de niqitand,paşê hêdī derket...

Wê rojê pez guhêrda ma...

sala 1975-a.

## XAŞXAŞK

Bahar ko ser gundê me de tê,meriv tirê ew qulçekī cenetê ye.Dora gund, çarnikal leylan radibe,xulīna ava kaniya ye,çivte-çivte çivīka,dengê bilbil her dera belav dibe,hewa xweş dibe,bīhna cenetê ji erdê ū ezmīn tê, meriv qet hiznake ji der bête hundur...Lê kulīlk?...Kulīlkê gundê me ewqas pir ū bedew in,wekī merī heyra wan dimīne.Bawer kī,ne Armaxanê ū ne jī Elegezê ewqas kulīlk tunenin.

Mala me ser hafa gelī ye,binetarê çemê zenguyê dikşe.Ji mala me heta devê baxirêd kulīlkêd pirawaz şīn dibin.Wexta meriv jor de dinêre,qey bêjī qīza Kurda temeziya serê xwe yên reng-rengī şūştiye ū li ber tavê raxistiye.

Ezī piçūk būm.Min ū bahara qīza cīnarê me dersxanekê de dixwend.Ax,ew bahara nas!...

Navīna min ū wê qet xweş nedibū.Ewê timī min re digot "tirsonek" ū ez gelekī ber xwe diketim...

Rojeke baharê ye Lehdê (yekşem) bū.Tīrênca (tirīj) tavê mīna neynikê avêti bū otaxa me.Min dixwast teze kincê xwe li xwe kira,gava bahar hate hundur.Min xwe xewarī danī.Ew nêzīkī min bū ū bi eks got:

- E,tirsonek,tu hê razayī yī,xwe ne êvare Ehmedê pêçekê yī?De,em bêjīn tu tirsonekī,merivê tirsonek kengê ji mal dertên?

www.netewe.com

Ax,ew bahara nas,qe çare pê nedibû.Ez çiqasî jî diçirçirîm,wekî ispat kim,ko tirsonek nînim,lê nedibû,dîsa ya xwe dikir.

Wextê min kincê xwe li xwe kirin,ewê gote min:

- Tuê bêî em herin xaşxaşka biçinin,hevalêd me gişk çûne.- Ez qayil bûm û em derketin.

Baharê kincê spî li xwe kirî bûn û vî alî-wî alî direviya,eynî mîna minminîka baharê.

Em gihîştine hafa gelî.Zara kulîlk diçinîn û pê re jî eşq distiran.Baharê jor de li binê gêlî nihêrî,vegeriya ser min û got:

- Şiko,em herne gêlî,kulîlkê wir gelekî rind in.

Min binê zerê nihêrî,xaşxaşka gevez dikir û ber baê baharê nerm serê xwe dihejandin.

Şiverê re em hêdî peya bûn.Baharê nişke ve destê min girt û got:

- Ez ditirsim peyayî gelî bim...

- Ne te min re digot tirsonek?

- Tu natirsî ?...

- Çima bitirsim?...

Ew keniya û got:

- Wekî tu natirsî,ez jî natirsim...!

Em peyayî gêlî bûn.Me gelek kulîlkêd cûre-cûre çinîn.

- Bes e,em herin,- Baharê got û li hevraz,hafa gêlî nihêrî,ko xêlekê pêşda em ser sekinî bûn.

- Şiko,hela binêre,ew kulîlka hanê dev zinêr çiqasî mezin e û çawa kubar serê xwe dihejîne.

Min jî li jor nihêrî.Kulîlka,ko wê texmîn kirî bû,ber devê şkeftê bû,lê riya şkeftê gelekî çetin bû.Min gelek cara dîtî bû,ko xortê gundê me şert digirtin,ko herne şkeftê.Ê ko diçû sax-silamet vedigeriya,lê zarêd weke me turuş nedikirin hilkişîyana.

Min careke dinê jî li zinêr û kulîlkê nihêrî.Serê min de fikrek xuliqî Çi cûreyî mabe wê kulîlkê jor de bînim.Min baqê kulîlkê xwe da destê Baharê û lez ber bi zerê çûm.Baharê metelmayî li min nihêrî û kire gazî:

- Ku da diçî?...

www.netewe.com

- Ez diçim wê kulîlkê bînim,- min got û ber bi zerê bezîm.

- Were,ne lazim e,were,tuê bikevî!- Baharê gazî dikir û îske-îska wê bû, digîriya.

Lê ez êdî hildikişiyame şkeftê,bi wî meremî,wekî eseyî kulîlkê bînim.Jêrê dengê Baharê dihat.

- Tê bikevî,peya be! - pê re jî digîriya.

Min dixwast bida ispat kirinê,wekî ne tirsonekim...Bi halekî çetin gihiştime kulîlkê.Xaşxaşk bû,min hela xaşxaşka wisa mezin û bedew nedîtî bû Min ko lîlk bi dranê xwe girt û hêdî peyayî erdê bûm,ew raberî Baharê kir. Ew̃e bi çavê hêsir li min nihêrî û dengekî melûl got:

- Lê wekî tu biketayî?

- Xema min nîn bû!

- Vir ha da êdî ez te re nabêjim tirsonek.

Baharê kulîlk bêhn kir,kire nava baqê kulîlkê xwe û bi eşq got:

- Eva kulîlka herî bedewe!

sala 1967-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Miya meye serī qerqaş za bū,berxekī kerī qerqaş anī bū.Şabūna min bē hed ū hesēb bū.Min gurmiya berxē danī bū ser kefa destē xweyī çepē ū pē destē rastē dikuta,wekî wexta berx mezin be,dawa wī gulover be,bibe beranekī rind.

- Kero can,- min berxē xwe re dilīst,- tu gotī bibī beranekī wisa,wekī nava pezē ēl-eşīrē de tune be.Wexta em herne çiyē ezē bona te kulīlk ū hēş-nayīa lapē rind bijbērim,wekī tu zū mezin bī.

Berxikē piçūk destē min dalast ū pē qoça lēdixist,te digot dixwaze min bide bawer kirinē,wekī wē bibe beranekī wisa,çawa ko ez dixwazim...

Ber çavē min berxkē piçūk mezin dibū,dibū beranekī kerī qerqaş,ser piş-tē bisk ū rīşīēd reng-rengī ber bi keriyē pēz kubar dimilmile...Mērē gundē me lē dinērīn ū havjiya (bija xwe) xwe beranē kerī qerqaş tīnin,ko berxē min buye,pē hēşnayī ū nanē destē min mezin buye...

...Sibekē,wexta me berx berī maka dan,me dīt,wekī berxē kerī qerqaş kozē de mirar buye.Ez gelekī ber xwe ketim.Axir min gelekī berxē xwe hez dikir.

- Hebe-tunebe,- bavē min got,- berxī hulī bū,xweliya dīwēr xariye,lewma hişk buye.Lazime çimento bīnin ū dīwarē kozē sīwax kin.

Miya serī qerqaş nava miya digeriya ū kale-kala wē bū berxē xwe digeriya. Ew ha nēzīkī vē ū wē berxē dibū,dikaliya ū bīhn dikir,lē berxē wē tune bū. Ew hat ber min sekinī ū kire kale-kal,wē tirē min dīsa berx hildaye,pē re dilīzim ū bi çava hēvī dikir,berxē wē bidimē.

- Heyfa miyē,- diya min gote bavē min,- şīrē çēlekekē dide,wē stewr be. Berxekē bavēje ber,bibenīne.

Bavē min mī kire gomē,berxekī hevalcēwī avēte ber ū gote min,şivkē hil-dim pēşiya mīē bisekinim,wekī berx bimje.Gava dengē berxē goma tarī de hat bū kale-kala wē.

Bavē min,ko gelek cara mī benandī būn,vē carē çi kir-nekir,mīē xwe neda ser berxē.Du roja me debr neda mīē,roja sisiya bavē min qure giyaē şīn avēte ber mīē ū gote min,wekī berxē bīnim.

- Mī ye birçī ye,wē giyē de bikeve,berxē bimije.

Mīē devek-dudu giya xwar,vegeriya ser berxē,bīhn kir,da ber qoça,giya hişt ū revī qulçē gomē...

www.netewe.com

Bavê min berx hilda û derkete der ve.Ewî postê berxê kerî qerqaş,ko diya min ser erzelê raxistibû bona pertala,li berxa hevalcêwî wergirt û dîsa anî hundur,berî ber mîê da.Mîê berx bîhn kir,kire kale-kal û rehet sekinî,post alast.Berxê bê xem mî hildikuta.Lê ji çavê mîê ji şabûna hêsir dibarîn û diketine ser postê berxa wê...

sala 1974-a.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Şev êdî nîvî bûbû.Neferê malê dora cîhê zozana nexwaş rûniştî bûn û ker diponijîn.Otaxa Sedrî bû.Tenê car-carana nale-nala Zozana nexwaş dihate bihîstinê.Neferê malê,gişka li wê dinhêrîn û herkes tanga xwe de hazir bû qulixî nexwaşî bike.Lê Zozanê tu tişt nedixwast.Malxwê malê,Eliyê mêrê Zozanê ji cîn rabû û gote nefera:

- Herin,lawo,herin razin.Ew sê şev e we çav nedaye hev.Tu kes ji cîh neleqiya.Elî dilê xwe de şabû,wekî neferê malê qedrê kewaniya wî digrin.Xwe û xwe ji cîh rabû,Elî û Emerê neviyê xwe,le gel diya xwe çûbû,hilgirt û bire otaxa wan.Paşê vegeriya bi zorê Mecîtê kurê xwe û Geveza bûk jî verêkirin.

Otaxê de Elî û Zozan tenê man.Elî kursiyê xwe bir danî tanga serê Zozanê destê wê girt û ser de mêl bû.

- Zozan,Zozan,-dey lê kir.

Zozanê hêdî çavê xwe vekirin,li Elî nihêrî.Lêvê wê nerm çûn-hatin,xwast tiştekî bêje,lê zarê wê negeriya.Du hêsir ji çavê reşê şêlbûyî gulol bûn û ketine ser balgih.Elî desmal ji cêba xwe derxist,hêsrê wê paqij kir û dilê wî ranegirt,desmal bide çavê xwe.Kelegirî da qirkê,Lê Elî xwe zeft kir,nexwast Zozan dengê giliyê wî seh ke.

- Zaroya bişîne bila razin,- dengê Zozanê qey bêjî gelîkî kûr hat.

- Çûn,Zozan,hêja çûn.

Zozan xulmaş bû.Dû yê cixarê bû xeleq û Elî nava wan xeleqa re rojêd buhurî dîtin...

Zozan qîzeke bedew bû,Bejne zirav,mîna tarhanê,eniya gever û sûretê tijî, qey te digot du bokonê genmê sor e qelandine,ko hêja ji çaberê derxistine. Zozan dergistiya Elî bû...

Elî ser Zozanê de mêl bû.Bêhna wê encax derdiket,te qey digot beraşekî aş a danîne ser sîngê wê. ( kevirekî ês danîne ser sîngê wê )

- Tê bîhra te,Zozan,- Elî dilê xwe de gotê,- Me li Axmixanê,çiyaê Sofî danî bû,wexta daweta me kirin,obe çiqasî şa bû.Ez wê taê tenê bûm û cînara çavronkayî didane bavê min î rehmetî,wekî dû yê ocaxa wî netemirin.

Zozan welgeriya ser kêlekê.Elî pişta wê nixamt.

- Tê bîhra te,ça naê bîhra te,Zozan,sala dinê ez şiwan bûm,te nanê min dianî çolê.Pez diadilî,min nan vedikir,lê te nedixwar,te digot,wekî min mal da nan xwariye,tu bixwe.Lê nan ber minda nediçû,heta te parîk nexwara.Se ê meyî Baser dora me diçû-dihat û şabûna dikire ewte-ewt.Min serê miya meye kure sor-

www.netewe.com

belek digirt û te qêxda didot. Me hûrdikire nava şîr û dibû çelpaçelpa Baser.

Rojekê te nanê min neanî.Dilê min bê sebr dikuta.Tu du hala buyî,Zozan.Nîvro,wexta min pez ber bi dana anî,Gulîzera cînara me ber min da hat û çavronkahî da min,wekî me re kurek buye.Ji şabûna navîna min û ezmîn da bihostek nema.Min Gulîzarê re soz da du kîlo kişmîsê rind bikirim,lê...Min wisa jî kişmîş nekirîn.Berêvarê behsa nebixêriyê çiya û banî hildan.

Şer bû...

...Roja dinê ez çûme şer,Zozan.Me pê re negihand navê kurê xwe jî lêkira.Paşê we mi re kaxez şand,wekî bi xwastina bavê min we navê wî kurkî daniye Mecît.Lê em nava xuriyê agirda bûn.Dijmin mîna gurekî devxwîn,dikire zûkîn û pêşda dihat.Berxwedana me bûbû ê kevir û me taba xwe danî.Ez ser topê bûm.Nêzîkî Lenîngradê şerekî giran bû.Wê rojê me cara sisiya hucimkirina dijmin şkand.Lê dijmin mîna dehbê brîndarî li çav xwîna xwe keve harbuyî dihat,min car nihêrî ko top qulozî ezmîn bûn êdî tu tişt naê bîhra min.Nizanim çiqas zeman derbaz bûbû,wexta min texmîn kir,wekî sîngê min dêşe.Min çavê xwe vekirin.Yekî faşîst ser min re sekiniye,lûla tifingê diniçîne sîngê min,û bi tiliya min dide serwextkirinê,wekî rabim.Min texmîn kir wekî lingê minî rastê nagire.Ez venuhurîme ser xwe û min dît;saqa sapoka minê rastê qelişiye û di xwînê de mewiciye...

...Dera otaxa kêlekê vebû,Mecît hate hundur.Dît,bav li ber serê dê rûniştiye û destê xwe kutane ber eniya xwe.

- Bavo,dihênijî,- Mecît gote wî,-here hinekî serê xwe deyne,ezê cem yadê bim.

Elî qey bêjî,ji xewê hişyar bû.

- Na,lao,na,tê sibê herî xebatê,here rehet be.Diya te jî razaye.Ezê vira bim.

Mecît texmîn kir,wekî çetine bona bavê niha ji kêleka dê rabe.Çiqas tê bîhra wî-ewana deqekê bêy hev sebr nedikirin...Û nexwast dilê bavê bişkêne. Mecît ker vegeriya otaxa xwe...

Elî destê Zozanê girt û hêdî mist da.Bîhranînêd wî dîsa,mîna mêkutan...

* * *

...Min êdî te re kaxez nenivîsîn Zozan...Ji tabûra me em 17 kes mabûn.Gişke brîndar.Şeş faşîsta em kiribûne nav xwe û dibirin.Kuda dibirin?Me nizan bû. çarmedorê me rêl bû û lûlêd tifinga devê xwe vekirî bûn û mîna guhustîn li me dinhêrîn.Sê cara ro derket û çû ava.Em brîn bûn,kesirî,lê talaşa faşîsta bû? Wana nanê xwe dixwar,ava wan hebû û her tenê tiştek digotine me;Herin! Kî ji me paşda dima,gulle dikirin.Wisa dihatine kuştinEz derheqa xilasbûna xwe de

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

na,Zozan,ez derheqa te de difikirīm.Min zanibū,wekī ya min ēdī boşe,ez ji devē mirinē xilas nabim.Min hingē tiştek dixwast:Kurē me sēwī mezin nebe.Ez fikra xwe de hatime çiyaē me.Min pez berī pala Sofī dabū,te ū Mecīt ve nanē min dianī.Ax min çiqasī bēriya nanē destē te kiribū.Nişke ve nizē pişta min re çū,ez ser hişē xwe de hatim ū min dīt,wekī ji hevala paşda dimīnim.Min xwe lezand,lē teqet ēdī di min de nema bū.Ez kundirī çūme erdē.Lē heval milē min girt ū em pēşda çūn...Ēvarē em birine gundekī.Sereskerekī faşīst qure-qure ber me re diçū-dihat ū kire xile-bil.Tercumanī ( wergēr ) me re got:

- Kī miqabilī Hītlēre wē tēkeve halē we.

Rastī jī halē me ne hal bū.Kincē me girtilī būn,bēçiyē lingē me sapoka ra derketibūn der ve.Ser sūretē meye nekurkirī būbūne kelem.Em teraş nebūbūn.Qerez em hēsiriyē de būn.Lē kubarī dilē me de hebū,Zozan,ko ser dēmē me her yekī ferah kifş bū.Em ji mirinē neditirsiyan!

Emē bēdeng būn...

Paşē ewē em anībūn dakūmentē me dane tercuman.Ewī bilind-bilind navē me dixwend ū seresker re şīrove dikir,çi ka kī kī ye.Her sēzde hevalē min Ūris būn. Navē min xwend.Seresker nizam nebihīst,ya fehm nekir,gote tercumanī,wekī dīsa bixwīne.

- Eliyē Mecīd Simoyef,Kurd.

- Kurd,çavē seresker fireh būn ū lēva wī yē jērin daliqiya,mīna lēva hespē pīr.

- Tu çi dikī li vir,- Ewī zmanē Ūrisī tevhev kir.

- Çawa hevalē min,- min li çavē wī nihērī ū Ūrisī got,- Welatē xwe diparēzim.

Bū hīre-hīra wī,mīna hespekī ji erebē berdin.Paşē çavē wī tijī xwīn būn ū mīna seyekī har xūrūşī ser min kir.

- Han te re welat,- ewī kire qūjīnī ū peynek li binē navka min da.

Min wisa zanī dilhinavē min jorda hatine xar.Wexta ez ser hişē xwe de hatim em avayī kī piçūk de būn.Heval bi sirē dihatine ruyē min ū Īvan got:

- Maladēs,Aliyoşa,te cewabeke hēja da wī segī.

Ēvarē em kirine maşīnē ū şandin Lehistanē lagēra dīla.Lē halē min gelekī xirab bū,canē min pē de werimī bū ū eger heval nībūna,çetin ez sax bimama...

. ..Zozanē av xwast.Elī derbekē de nebihīst.Bīhranīna ew ji vē demē dabūne birīnē.Zozanē bi xeyd got:

- Razayī,malavao,zarē min çila buye.

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

Elī hahaniga av anī.Destekī xwe da ber serê Zozanē ,bi destē dinē şelbik nê-zīkī lêvê wê kir,Zozanē qultek vexwar.

- Of,çi avek xweş e,qey bêjī ji kaniya Sofī anīne,- Zozanē got- sibe gelek maye?

- Hê sē saet hene.

Zozan welgeriya ser piştē.

Elī cixarek vēxist ū nava malē bēdeng çū-hat...

* * *

...Em sē sal nîva dīl man,Zozan.Ew doja ko dibējin,hema cīhē me xût wisa bū. Niha jī wexta ew rojē reş-heş tēne bīhra min,porē serē min dibe şijūn.Tenē çerm ū hestiyē me mabūn wextē em aza kirin...

Derī hēdīka kutan.Elī carekē re seh nekir.Bīhraniyē wī mīna şiliyē biharē s er kutabūna serē hev,venedibirīn...

Derī vebū ū Seyadē dixtor hate hundur.Ewī germa ( ta ) Zozanē çap kir (pîva) ū derzī lēxistin.

Elī li çavē Seyad nihērī,Seyad serē xwe kire ber xwe ū bêdeng derket.Elī ji dēmē Seyad texmīn kir,wekī Zozan qolayīye,gelekī qolayīye...

* * *

...Ez ber bi mal dihatim,Zozan! Ax,çi xwaşbextīke mezin bū demē.Em xilas būn ū ez rūspī vegeriyam,vegeriyame mal,cem te.Mecīt,Zozan!...Ez vegeriyam,lē min nizanbū,wekī ew ecēba giran hatibū serē min.Zozan...Min nizanbū...Wekī min zanibūna,Zozan ez bi tirba bavē xwe sond dixwim,ez tu cara venedigeriyame mal... Lē... - Du hêsir ji çavē Elī gulol būn,ketne nava simēlē wī ū ser lēvē wī de niqitīn.Hēsir germ ū şor.

...Ez ji merkeza nehiyē peya dihatime gundē me.Tē bīhra te,Zozan,ez ū tu du cara tevayī wē re hatibūn.Carekē min tu anī yī dranē te zēr kir,carekē jī wexta tu nexwaş buyī.Min tu mehīna meye Sebrē siwarkiribuyī,destkēş dikir.

Tē bīhra te,Zozan,wexta em gihīştne serē zeviya Bertop,te got: " bisekine " bahar bū.Erdē kesk ū sor dikir. "dilē min pincara çolē dixwaze " - te got. Min hēdīka tu peya kirī,berzīng danī,tu li ser dayī rūniştandinē,min dest kir ū te re pincar çinī.Min sping,xezalok,tolik,tirşo çinī.Xurşka hespē de.xwē hebū.Me têr pincar xwar,te gote min : "Ez pak būm Elī,em vegerne mal ".

Ez hatim,li serē zeviyē rūnistim ū yek-yek bīhra min da bū,min ji ku sping

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

xezalok,tolik,tirşo çinī bū.Ez gelekī rūniştim.Rojêd buhurī dihatne bīhra min. Ro dageriya ū min lezand.Nizam çima,xofek ketibū dilē min,wekī ezē te ū Mecīt ve sax-silamet nebīnim.Min rē nēzīkī gund kir,ser riya mala me birek berx diçēriyan.Kurekī 5-6 salī şivka xwe kiribū nav lingē xwe,xwe hespē siwar buye ū pē şivka xwe li "hespa"xwe dixist.Çavē kurik reş,porē wī çūrī qurişk.

- Bereket be ,kurkē delal.

Berxvana piçūk li kincē mine eskeriyē nihêrī ū bersīv a min neda.

- Tu kurē kē yī,berxa min? - min jē pirsī.

Kurkê piçūk çavē xwe ji min nedibirī.Nizam çima xwīna min ser wī kurkī wisa keliya ū min nedixwast jē dūrketama.

- Ḅavē min çuye şēr,- kurik serē xwe kire ber xwe.

Min tirē daxek dane nava cīgera min.

- Navē te çiye,çira min!

- Mecīt.

Gujīn ji serē min hat ū ber çavē min bū severeş.

- Tu kurē Elī yī? - lēvē min riçifīn.

- Erê, - kurik got ū xwast herebighīje berxē xwe,ko gelekī dūr ketibūn.

- Kurē min,- tenē min ha got ū kurik hemêz kir,sīngē xwe ve guvaşt,ramūsa,mīna dīna.Ji çavē min hêsir gulol būn,ketine ser porē Mecītī qurīşkī.Min şabūneke xwe êdī dītī bū,hemêzkiribū,wisa sīngē xwe ve guvaştbū,wekī tu kes tu kes nikarbe wī ji destē min derxe,lē derheqa ya dinda min turuş nedikir pirs kira.

Ez ū Mecīt ber ve berxa çūn.Ewī destē min hişkem girti bū,bernedida. "diya te mal da ye ?" - min bi xof pirsī."mal da ye ",- Mecīt got.Şabūna duduwa jī nēzīk dibū mīna peltē ewrē spī,ko li ser xweliya dêm de danizile ū baranē direşīne.Ji şabūna lingē min erd nedigirt.Ax,Zozan,xwezil hingē Mecīt bigota,wekī diya min nemal da ye,wekī ez hīştime,çuyī...lē...

...Nalīneke kūr ji Zozanē hat.Elī te tirē ji xewē hişyar bū ū dīna xwe daē,wekī qilça lihêfē ser Zozanē çuye,pişta wē vekirī maye.Elī pişta wē nixamt ū ser de mēl bū.

- Tiştekī naxwī,Zozan,- Elī hēdī pirsī.

Zozanē serē xwe hejand.

Elī bēdeng di kēleka Zozanē de rūnişt.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

...Tê bīhra te Zozan,Min destê Mecīt girtibū ū dihatme mal.Tu çav me ketī ū çuyī hundur.Min zanibū,te şerm kir,pêş xelkê ve ber min de bihatayī.Tu şermoke buyī,Zozan.

Heval-hogir,gundī-cīnar hatne çavronkahīê.Gund da şabūn kete malekê jī ū xemê gund bi yekê ve jī kêm būn.

...Êvarê ez ū tu tenê man.Mecīt westiyayī bū,raza.Me telī-tengasiyê xwe pev re gilī kirin,rojêd derbazbuyī bīhr anīn.Tê bīhra te,Zozan,tu rabuyī ū te got: "dilê min ve eyan bū,wekī tê bêyī.Du roja pêşda min nvīn teze kirin,tu jī westiyayī,zū ve nava cī-nvīnada ranezayī..."

Lê wê şevê çi qewimī,Zozan,yek ez hay ji pê heme ū yek jī tu ū yek jī rebê jorin...Wê şevê min texmīn kir,wekī ecêbeke giran,hatiye serê min.Wekī ez raste sax im,Tê miriyê neçalkirī me,wekī ewī kūçkê faşīst pê pêhna xwe...

Xuhdaneke sar ser Elī ve avêt.Ewī kursiyê bin xwe diha nêzīkī cīhê Zozanê kir,serê xwe danī ser balgihê wê ū çavê wī mīna piznī li ber baranê dilop kirin.Elī encax xwe zeft kir wekī neke kūre-kūr...

- Ne min ber te lava,reca dikir,- Elī bilind got,- min te re got,wekī Mecīt tenê min re bihêle,wekī dinê çi mal da heye xwe re top ke,bibe.Lê te destê min d ane ser çavê xwe ū got:"ez qilīçkeke te panzdeh mêra re naghêrim.Çima ciwaniya min ya te çêtir e?..."

Ez ro-ro diheliyam,mīna būza (qeşa,cemed ) ber tavê.Nava çendekī de porê min çīl-qerqaş bū,çavê min kor da çūn ū qerçīmok li ser dêmê min būne şov... Min texmīn kir,wekī ez dikevime ber gunê te,weki ew qezayagiran ko şêr anībū serê min,tevī min wisa jī tu bextreş kirī.Ez bi tirba bavê xwe sond dixwim, Zozan,wekī Mecīt nīn būna,minê serê xwe hilda ū çola ketama,biçūma,biçūma,wekī bedbextiya te ber çavê xwe nedīta...Lê destê min ji Mecīt nedibū.

Tê bīhra te,Zozan,rojekê tu ne li mal buyī.Ez xwe re difikirīm,wekī mirin gelekī ji vī halê min çêtir e.Min rabū weris anī,avite stūnê gomê ū xwast xwe bixeniqīnim.Nizam wê demê tu ku ve hatī.Te texmīn kirī bū,wekī ezê çi bikim. Tu hatī ber weris sekinī ī te got: " Pêşiyê min ji eziyetê dinyaê xilas ke, paşê vê yekê bike.Mala te xirab be xwe tu ne zarokī.Xelkê bêje,çika jina wī ye. Hezar dost-dijminê te hene".Te êdī tişt negot,Zozan,hêsra tu xeniqandī.Pêy hatinê re min cara pêşin hêsrê te dītin.Lê min fikira te fehm kir.Ez xeterê te bū,Zozan,Min zanibū tu qīza çi malê yī ū min te heyī nekir.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

(serhatiya kevn )

Kalkē minī rehmetī gelekī ji min hez dikir.Ku de biçuya:mala cīnara,yanē ser " hoşka„ gund,li ku gundī berev dibūn ū derheqa rojēd derbaz buyī de,hal-wextē dinē de xeber didan,ez eseh jī xwe re dibirim.Ū timī ew şīreta han dida min.- guhdar be,lao,bibihē ka mezin çi dibējin,giliyē wan tēke guhar bike guhē xwe.Kī gora mezina bike,dinē de lingē wī kevira nakeve.

Rojekē jī,wexta mērē gund li ser " hoşkē„ top būbūn,kalkē min eva serhatiya han gilī kir,ko tu wexta ji bīhra min naçe ū īro min qerar kir eve serhatiyē teslīmī kaxezē bikim.

- Emē hela li ērē būn,- Cīnekē,- kalkē min serhatiya xwe weha destpē kir.
- Ew sē roj būn berf dibarī ū pē re jī dikire bager.Berfē kurşe girtibū ū cīnar nikarbū biçūna mala cīnēr.Roja çara,nēzikahīya nīvro,bagerē vekir. Me pē bēra berfa hewşē hinekī temiz kir ū pez dirūnge kir.Ezī cahil būm. min qapūt avēte navmila xwe ū nava pēz de sekinīm.
Wextekē min bala xwe daē,wē peyakī xwe rast mala me girtiye ū tē.Min texmīn kir.wekī ne gundiyē me ye.Gelo kī ye,vē berf-bagerē daye serē rē.Hat-hat,min bala xwe daē ,eva Silēmanē kurē Eliyē destebirakē bavē min e.Ez ecēbmayī mam.Mala bavē Silēman çend sala pēşda gundē kēleka me dima.Silēman gund de mēr kuşt ū wana mala xwe bar kir çūne aliyē Qersē...
- Kuro Silēman,te xēr e?- ez ber de çūm.
- Şikir min xēr e,- Silēman kenī.

Em çūne dest - ruyē hev,paşē min gotē:
- Kuro Silēman,bela te ji Xwedē be,vē berf-bagerē te çima daye serē rē, tu ji ku tē yī?
- Mala Evdiyē Qaso,- Silēman caba min da.

Min guhē xwe bawer nekir.Silēman Keremē birē Evdī kuştī bū.
- Kuro,derewa meke,hon dijminē hev in,te birē wī kuştiye,tu çi qewī çūbū yī mala Evdī?
- Serma dikim,- Silēman gote min,- em herne mal,ezē te re gilī kim. .

Neferē malē Silēman şa būn,ha-hanga çarix-gorē wī ēxistin,agirē bixiriyē gur kirin,nan anīn.Silēman nan xwar ū gilī kir:

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

- Îro sê roje ez ji mal derketime.Eliyê bavê min got,lao,eva sê-çar sale em ji aliyê Sînekê hatine,hay ji mala destebirakê xwe tune me.Hema xwaş e, tu jî cahilî,rabe bide serê rê,here serîkî bide mala destebirakê min,were. Pê re jî tembih da,wekî ez ku ve bêm,seba rastî meriyê mala Evdiyê Qaso neyêm.De,min jî zû ve hon nedîtî bûn,mihtacê we bûm,min tifing avête stu-yê xwe û da serê rê.Ez hatim derbazî xweliya Sînekê bûm,tarî li min kete erdê,berf barî û pê er jî kire bager.Îlaca min heta birrînê.Min nihêrî xêr,ezê bixeniqim.Lê ku de herim?Min zanibû wekî heta gundê we epêce erd e. çawa bikim? de,min go,ser riya min gelek gund hene,ezê herme malekê,îşev bibime mêvanê wana,sibê rabim,herim.

Ziviniya bagerê bû.Min texmîn kir,wekî zuhreke sar,mînanî cûrekî şîn, hestî-hinavê min dibire.

Gundek kete pêşiya min.Şeveres e,nizanim gundê tê ye.Lo min go,ceheni-mê de,çi dibe, bila bibe,ezê derê vê mala hanê qeraxa gund bikutim.Îşev li vira bimînim,sibê herim.Min derî kuta.Derî vebû û hulma bixêriye germ carekê de dêmê min xist.Ez dibêm min qet êvarxêrî jî neda xwediyê malê û çûme hundur.Wexta ser milê xwe vegeriyam,cih de bûme risas.Ber dêrî Evdi-yê Qaso sekinî bû.Min xwast paşda vegerim,lê ewî milê xwe dane rexderiya û pêşiya min girt.Min dest bire tifingê.

- Dest nebe xwe,xorto,- Evdî hêdî gote min.- Mêvan-mêvanê Xwedê ye,hiz kî bila dijmin be,birê te jî kuşti be.Tu îşev tu ciha de naçî.

Min xwexwe ji xwe şerm kir,wekî dest bire tifinga xwe.Lo cenimê de jî min bikuje.Bila merî kuştî be,lê kuştiyê mêrê çê be.Ez sekinîm.

- Qîzê,- Evdî gazî kulfeta xwe kir,- were çarix-gorê mêvan bêxe.

Jina Evdî jî ez nas kirim û metelmayî li mêrê xwe nihêrî.

- Qîza cindî,Xwedê xenîmî min be,gava birê min,yanê gedê me pê bihesin, wekî Silêmanî mala me de ye,tu tu cara sax ji vî derî yî dernakevî.

Rabû hebûrekî terikî wê şevê erdê xist.Qerez,du roja bagerê venekir.Ev-dî ez bernedam.Du roja ez mala wî de bûm,xwarin-vexwarin,azed-qulix.Heta îşev dest berbangê bagerê vekir,Evdî gazî min kir:

- Silêman,lao,bagerê vekiriye,gundê mala destbirakê bavê te jî nêzîk e.

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

Rabe ez te verēkim,hīna gund hişyar nebuye.Cahil-cuhulē me bē terbiyetin, niske ve ecēbekē bīnine serē te.Paşē ēl-eşīrē heta-hetaē gora bavē minē bējin.Kurmanc mala xwe de tu wexta,hizkī birē wī jī bikujin,nabeze mēvanī.

Em rabūn.tifinga min sivderē de dardakirī bū,lē min şerm kir hilda.

Evdī tifing avete milē xwe,ez anīm ji gund derbaz kirim.Kew ēdī ketibū sibē.-Silēman,lao,ewī han gundē mala destebirakē bavē te ye,ewa hana jī mala wan...

Wisa jī sal derbaz būn,Zozan,lē sir a me wisa jī navbera me da ma...Niha tu nexwaşī,Zozan,evīn ū razē xwe dibējim,bila serē min ber serē te keve. ...Elī destē xwe bire bin orxanē ( lihēf ) wekī destē Zozanē mist de,lē destē wē sar būnElī banzda ser xwe,serē Zozanē li ser balgih ber bi Elī mēl būbū...Dinya li ber çüvē Elī şeve-reş,qudūmē wī sist būn ū ewī xwe avēte...

* * *

Roja dinē du tabūt ber bi meqber dibirin.Ū tu kesī nizan bū,wekī xēncī herdu cinyaza,ewana sir'ekī jī teslīmī erdē dikin,Sir,ko tenē Zozan ū Elī hay jē hebūn...

- Şīrē wanī helal bū,- cimaeta gund digot,- jintī-mērtī gotī wisa be ū serxweşī didane Mecīt...

1970-76

www.arsivakurd.org
www.netewe.com

# N A V E R O K

| | |
|---|---|
| Çend gilî derheqa xwediyê kitêbê re | I |
| Nîşanî | 2 |
| Nuxsan (kêm) kirin | 7 |
| Qîza porqîçka dêresor | IO |
| Berê darê | I9 |
| Sehet | 3I |
| Baran | 36 |
| Emo | 38 |
| Tojen (meşk) | 4I |
| Gaê meî Lado | 43 |
| Dara merxê | 46 |
| ...Û Çilke xwîn | 47 |
| Xaşxaşk | 5I |
| Mî | 54 |
| Sur (sir) | 56 |
| Dijmin jî gotî qanyan be | 62 |

www.arsivakurd.org

www.netewe.com

KOMELEY XWÊNDIKARANÎ KURD LE EWRUPA

(Kurdish Students' Society in Europe)

Kurdish Students Society in Europe
afd. Nederland Postbus 30234 Arnhem

www.arsivakurd.org
www.netewe.com